

ARMANC
Jî mehê
carekê
dertê
Hejmar: 93-94
Rezirân-Tirmeh
1989
Buha: 10 Skr.
2.5 DM

Armanc

SERXWEBÜN DEMOKRASİ SOSYALİZM

ARMANC
Monthly
Kurdish
Magazine
No: 93-94
June-July
1989
Price: 10 Skr.
2.5 DM

Enternasyonala Sosyalist:

"Rewşa Kurda trajediya xwe didomîne"



Enternasyonala Sosyalist Kongra xwe ya 18'an li Stockholmê pêk anî

Enternasyonala Sosyalist kongra xwe ya 18'an di 20-22'ye Heziranê de civand. Ev kongre, di salvegera 100 saliya Enternasyonala Sosyalist (Enternasyonala II.) de pêk hat. Ji ber vê yekê ev kongre ji bo sosyaldemokratan hîn gîfingir bû.

Di kongrê de ji çar alyîn dinê nûnerên partiyê sosyaldemokratan besar bûn. Wek mîvan Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê û Abdurehman Qasimlû, li ser navê Cepha Kurdistanê Serokê Partiya Demokratî Kurdistan-Iraq Mesûd Barzanî û li ser navê Yekîti Nişîmanî Kurdistan berpirsyarê duduyan Noşîrvan besar bûn. M. Barzanî û A. Qasimlû li

ser rewşa Kurdistanê cihê cihê ci-vînên çapemenî çêkirin.

Serokê Partiya Pêşverû ya Sosyalist a Libnanê Welid Canpolat di axaftina xwe ya di kongrê de, ciyekî fireh da rewşa Kurdan. Wî di axaftina xwe de van rastiyen diyari sosyaldemokratîn dinê kir;

"Kurd roja îroyîn, nemaze li Iraqê di bin zulmek sistematik de ne. Ji milyonekî zêdetir Kurd hatine surgûnkin, 8 hezarê wan qurbana çekêni kîmyayî ne û nêzî 4 hezar gund bi erdê re hatine yekkirin".

Dûmahîk r. 11

Armanc di kongra Enternasyonala Sosyalist de bi Welid Canpolat re û bi Ingvar Carlsson re peyivî

rûpel 3

Welid Canpolat di kongra Enternasyonala Sosyalist de got:

"Kurd di bin zulmek hov de ne"

Em axaftina Serokê Partiya Pêşverû ya Sosyalist a Libnanê Welid Canpolat ku di kongra Enternasyonala Sosyalist kir, pêşkêsi xwendevanan dikin:

Ji bo aşıya cihanê Rojhilata Navîn ciyekî hesas e û hergav bûye herêmek tevliheviyê. Di vê herêmê de îhlalkirina mafêni mirovî bûye tradisyonek.

Di vê herêmê de pirsgirêk gelek in. Bi taybetî pirsên ku li vê herêmê bi acîli divê bêni çareserkirin sisê ne. 1) Lubnan, 2) Filistin, 3) Pîrsî gelê Kurd

1) Lubnan di dramek nedîti de û mehûkirina şerekî berdewam de ye. Partiya Pêşverû a Sosyalist bangê

Dûmahîk r. 11




Foto: Eva Vaihinen




Foto: Armanc

ren Kurdistanê û surgûnkinâne Kurdan jî agahdarî da got ku, "Nuha 40.000 km. cargoje erd ji binde wêrankirine û gelên van herêman jî di kampan de dicivinîn".

Mesûd Barzanî li ser alîkariya welatên Ewrûpa bi Saddam re ji wiha got; "Heger ku imkanen welatên Ewrûpa nebiya rejima Saddam nikaribû çekêni kîmyayî bi dest xista. Gelek fabrikên Ewrûpi-

Komîta Giştî ya TEVGER'ê civiya

"Divê em bi gelê xwe û siyaseta xwe bawer bin"

Di meha çûyî de Komîta Giştî ya Tevgera Rizgarîwaz a Kurdistanê civîna xwe ya demî çêkir. Di civînê de xebatê TEVGER'ê yên van şes mehê dawiyê ji ber çav de derbas kir û ji bo xebata rojêni pêş hin biryarehnuh girt. Her wisa TEVGER'ê bûyeren siyasi yên dînyayê û Kurdistanê munâqîse kir û nêrinê TEVGER'ê bi belavokekê diyar kir.

Belavok li ser têkiliyê Yekitiya Sovyet û DYA radiweste, ji bo aşıya dinê peymana ji ortê rakirinîna roketên navçemenzîl û ji bo cemidandin û daxistina roketên dirêjmenzîl diyaloga di navbera YKSS û DYA de sedemê nermbûyîna îroyîn dibîne û weha dom dike: "Li gor demeke usa baş ku dest pê kiriye, DYA, li ciyê ku roketên kurt jî daxine, yan bi temamî ji ortê rake, dîsa hewl dide ku wan nujentir bike. Vê yekê di navbera hevalbendê NATO'ye da pirs û problem derxistin.

Qismek ji van roketên menzîlkurt li Kurdistanê hatine bi cî kirin û kîngê şer derkeve, li gor gotina xudîyan, "ji bo sekinandina aliyê din" ewê bi kar bê, ango li ser Kurdistanê wê biteqin. Bi vî awayî, Kurdistan, li gor planê NATO'ye di şer da wê bibe nîşangeheke pêşin ji bo çekêni atomî. TEVGER van planê NATO'ye bi xurtî protesto dike, her usa jî wek mîsaleke bêşermiyê ji siyaseta dewleta Tirk nîşan dide. TEVGER dixwaze ku hemû

Dûmahîk r. 11

Mesûd Barzanî:

"Divê şerê me têkeve nav Iraqê"

Serokê Partî Demokratî Kurdistan; Mesûd Barzanî di 30'ê Heziranê de li Stockholmê civînek a-gahdariyê çêkir.

Mesûd Barzanî axaftina xwe du beş. Di beşê pêşin de ew li ser dema Abdulkerîm Qasim sekînî û got ku, "Di wê demê de jî 23 gundê Kurdan wêran kiribûn. Ji ber ku siyaseta Baas ew e ku gelê Kurd bi tevayî bîheline, ji ortê rake." Wî bi hin bûyer û numûnan nîşan da ku li ser aşıyîe Saddam ci dibêje bira bibêje derew e; ji ber ku ew, gelê Kurd wek miletekî û Kurdistanê jî wek welatekî Kurdan tu carî qebûl nakek. Ew, gelê Kurd wek grûbek mahcir û Kurdistanê jî wek perçakî ji erdê Ereban dihesibîne. Û ev yek di programa partiya Baas de jî heye.

Mesûd Barzanî her wiha di axaftina xwe de giraniyek mezîn da hevkariya di nav hêzîn hemû perçen Kurdistanê. Wî got: Divê di nav hêzîn hemû perçen Kurdistanê de hevkari hebe. Û ji bo çêbûna hevkariyek xurt, qala hin xebatan kir.

Ew, li ser dijminatiya berê ya di navbera hêzîn Kurd de hebû sekînî û got ku, "Şerê ku berê di navbera hêzîn Kurd de hebû kes iro ne pê kîfxwes e û ne jî serbilind e. Şer, zirarek mezîn da me. Heger Bereyî Kurdistan di sala 1980'î de; di dema şerê Iran û Iraqê de hebiya iro rewş wê ne wiha biya".

Li ser wêrankirina gund û bajâ-

Dûmahîk r. 11

Rojeva Mehî

Xwendevanê Çinî ci dixwestin?

Serokê Partiya Komunist a Çinê; Deng Siyaoping, dawiya dawî ordiyek li gor dilê xwe dît ku Tevgera xwendevanê Çinê bişkîne û wan ji Meydana Tienanmen bimale. Roja 3'ye Hezîranê ordiyê ji çar alî de bi tank û panzeran êris bir ser bi sedhezan xwendevan û di navbera çend rojan de meydan vala kir.

Li gor berpirsiyaren parti û hukumetê 200 kes, lê li gor ajan-sen cihanî 1200 kes hatin kuştin. Reqem ci dibe bira bibe, tişte ku li Meydana Tienanmen bû, qetşamek bû, paleteñ tankan laşê insanın cütin, bi maneya xwe ya esasi, xwin heriki.

Çima, çalakiyên xwendevanê Çinê ku di riya aştiyê te dest pê kirin û heta dawiyê bi wî awayî meşyan; çalakiyên ku bes meş û mistig û grevê birçibûn bûn, bi xwinê hatin temirandin?

Tu ji hukumeta Çinê biparsi, ev, hêzên dij bi şoreşê bûn, tiliya hêz û parastinê (muxaberatîn) Rojava û Amerîka, di vê tevgerê de bûn, dixwestin parti û hukumetê hilweşinîn.

Li gor, hin hêz û kesan ji sedemê rûdانا van bûyeran ew bûku, serok û berpirsiyaren Çinê, pişti mirina Mao, dev ji şopa wi berdan, râ li ber şoreşa kultüf girtin, dest bi avakirina mulkuyeta şexsî kirin, siyaseta aborî ya reqabeta serbest li dar xistin; çin û tebeqe, dewlemendî û feqîrî zêde bû, di warê idâra dêwletî de, imtiyaz, rişwet û sextekariyê destpê kir, loma gel seri hilda. Xwendevanen, karkir û ronakbiran dîsa xwestin ku dewra Mao destpê bibe.

Rojavayî didin xwiyakîrin, ku sistema sosyalizmê edî iflas kiriye. Çinî pêşveçün û demokrasiyek Rojavayî dixwazin, tevger, tevgera demokrasiyê bû ku hat pelçiqandîn.

Gava meriv li rastiyê dinêre, geleç eşkera dixuyê ku, gelê Çin ne ji rewşa aborî û ne ji ji ya siyasiya fro razîye.

Tevgera muxalif tevgerek gelemerî ye, di nerazibûnê de muşterekiyek wan hebe ji di daxwazîn xwe de hemû wek hev na-fikirin. Di nav xwendevan û ronakbiran de, helbet hin hene ku li dij sistema sosyalizmê ne, jiyanek rojavayî; kultur û demokrasiyek, heta aboriyek rojavayî dixwazin.

Her çend, xberen ber bi çav heta iro negîbiştine ku yêñ daxwaza dewra Mao bikin hene ji lê yêñ wiha ku hebin geleç kêm in. Tevgera muxalif a ku ji serokatî; siyaseta aborî û siyasi ya iro ne raziye, ne ku dewra Mao dixwaze. Bi xurtî, këfxweş in ku ji wê dêwre xelas bûne, razî ne ku guhertin û reform di welet de çebûne. Lê ew didin xwiyakîrin ku ev reform têr nakin; divê di warê aborî û siyast de hîn reformen esasitir bêñ li dar xistin. Lê reformen ku piraniya wan dixwazin di çarçeva sosyalizmê de ne, ew sosyalizmek demokratik, serbest dixwazin ku ne ji demokrasiya burjuwazî paşdetir lê pêşdetir be. Büyeren vê dawiyê ji didin nişandan ku sistema sosyalista iroyin ku li Çinê heye nikare bersîva ihtiyaciyan maddî û entelekuvelî ya gelê Çinê bide û Çinê di her aliyan de bi pêş xe.

Ne bes buyeren Çinê lê yêñ Yekîtiya Sovyetan, yêñ Polonyayê, yêñ welatîn sosyalist ên din eşkere dikin ku Sosyalizma iroyin muhitaci xweguhartin û xwenûkirinek esasi ye.

Helbet, piroblem, nexwesi, nerazibûn, şassi yan eşen din wê di civakîn sosyalist de ji hebin. Lê sosyalizm divê xwe bike sistemek wiha ku bêyi ku buyer bi berfirehi biteqin, bêyi xwin bê rêtin karibe seri di problem û eşan re derxe. Sistema sosyalist a iro ku, yek partîti heye, qanûnîn li ser rola partîyê diktatoriya partîtiyê datşin û parlamento û dezgehîn parlamentoî rola xwe ya esasi nikarin bilzin, maşî hemwelatiyê, maşîn azadiya fikri û rëxistini ne ci bi ci ne, ev sistema han bersîva gelên welatîn sosyalist nade. Ji bo ku riya pêşveçünê digre heta gav bi gav, ew bi xwe xelkê dibe dij bi sosyalizmê, li derva ji baweriya mîletan ji sosyalizmê dişkine.

Alternatifîa sosyalizma iroyin heye: ew ji sosyalizma pluralist (pirali) a parlamente. Bes sosyalizmek weha dikare him ji demokrasiya burjuwazî û him ji ji sosyalizma reel a nuha pêşdetir be. Xwendevan, karkir û ronakbiran Çinê sosyalizmek wuha demokratik dixwazin. Gelên welatîn sosyalisti ên din ji wê dixwazin. Riya, guherandina cihana me ya iroyin ji wê bi sosyalizmek wiha vebe.

10 saliya Armanc 10 saliya Armanc 10 saliya

Bareş Battê

Dema ku Armanc bi zimanê Tirkî derdiket min gelek kêm caran dixwend. Min digot ku bi tenê navê wê bi Kurdi ye û bi rastî ji wa bû. Lê dema ku Armanc bi Kurdi û bi tîpên latînî derket ez gelekî pê këfxweş bûm û hema di cî de bûm abonê wê.

Di destpêkê de hinek kême-siyen wê hebûn, lê bi rastî ji Armanc roj bi roj baştır û çaktır dibe. Di warê ziman de hêjî gelek caran devokê herêmî xuya dibin. Lê wek min li jor ji got ew ber bi başiyê ve dice.

Bi Zazakî nîvisin ji li gor bahweriya min gelekî baş e. Ev tiş wê alîkariya zimanê Kurdi bike ji bo hev baştır naskirin û di rîça zimanekî Kurdi î giştî pê-kanîn de pêşgaveke di cihê xwe de ye. Lê divê bi Soranî, lê dîsa bi tîpên Latînî ji nîvis derkevin.

Naveroka Armancê dewle-mend xuya ye. Wek hevpeyvîn û belgeyên bûyerên kevn ji nû de çapkirin ji pirr baş e.

Hinek caran di belavkirina hi-nek nûçeyan de derengmayîn ji ji rojnameyek re kême-siyek e. Armanc ji gelek caran di nû-çeyen weha de dereng dimîne.

Armanc hinekî biçüktir derke-ta wê ji aliye praktik de wergirtina wê û carna ji ji bo foto-kopikirinê baştır bûya. Hingê wek materiyalê xwendinê wê bihata bikaranînê. Wek ku tê zanîn mamosleyen me yêñ zimanê Kurdi materiyalên wek Armanc di karê perwerdekirinê de bi kar tînin.

Dîsa di Armancê de çaxê ku sernîvis têñ nîvisandin çewtî çedîbin. Gelek caran sernîvis wek zimanekî biyanî tê danîn û mana xwe ya Kurdi winda dike. Gerek aramanc ew be ku, "bi Kurdi fikir bête kirin" û "bi Kurdi ji bête nîvisin". Hingê wê çewtî roj bi roj kêm bibin. Ü ez bawer im ku armanca "Armancê" ji ew e.

Ez dîsa daxwaz dikim ku Ar-manc cihekî firehtir bide kurten-neyen li ser Kurdi û Kurdistan-nê. Wê çaxê wê xwendevanê Armancê bi rehetî doza Kurdi û Kurdistan û pêşveçûna wê bibîn, jê haydar bibin.

Digel ewqas tiş ji hêvidar im ku Armanc jiyana xwe bi serfi-razî berdewam bike. Xwezi kovarên me tev wek Armancê bi Kurdi û bi tîpên Latînî bana. Pêwîstiya zimanekî Kurdi giştî û alfabe-yekî yekcar gelek heye. Yekîtiya gelê Kurdi yê par-vekîri di nava çend dijminan de ji yekîtiya ziman wê dest pê-bikê.

Daxwaza min ew e ku Armanc di armanca xwe de bi ser keve.

Sebîhe Arjen

Armanc iro take rojname ye ku bi Kurdi çap dibe. Him di warê naverokê de û him ji di warê şikil de xwendevanê xwe têr dike. Lê carna ziman giran e û nîvisen wê dirêj in. Divê meriv rewşa xwendevanê Kurd bide ber çav. Piraniya xwendevanê Kurd xwen-din û nîvisandina Kurdi baş nizanin.

Ez hêvidar im ku, di warê teknika çapameniye de hin imkanen baştır bi dest xe û bes ne mejiyê xwendevan, çavê wan ji têr bike.

Ez weke Kurdekkê bi Ar-mancê iftixar dikim. Serfi-razî û serketina wê dixwa-zim.

Mahmûd Kîper

Armanc heme hejmaranê xu di Dimîlkî (Zazakî) binuso o do bol rind bo.

Şima zanê, Dimiliyan mîyan di tayn kesî vijjayê, vanê Dimîlkî û Kurdkî eyîn ziwan niyo û tayn embazê Kirdasî ji vanê "Dimîlkî nêbo ji beno". Qandê nê wîrdin meyîlan ji gerek kes Dimîlkî ser o vêşî vindiro. Winî nêbo embazê ki Dimîlkî qisey kenê û do embazanê Kirdasan ra biqahrîyê û beno ki tayn embazî vacê "wili raşt o, ma Kurdi niye".

Qando ki heme kesê ki leh-çeyenê Kurdkî qisey kenê pê ra fahm bikerê ji gere merdim Di-mîlkî ser o vêşî vindiro. Armanc heta ewro vêşî nêbo ji dest ra içi ameyo kerdo, ez bawer kena o do ewro ra pey ji bikero.

Gulistan: Bi ditina min di navbera rojname û kovarên Kurdi de Armanc ciyekî taybeti distîne. Ev sê sal e ez abona Armancê me. Armanc di van du-sê salen dawiyê de di rûpelên xwe de ciyekî fireh dide hunermendên Kurdan û ez bi vê ji serfiraz im. Lê ez nikarim bêjim ku Armanc cih dide pirs û pirsegirekên jînîn Kurd. Mesela di van salen dawiyê de vegetandinek mezin di navbera jîn û mîrîn Kurdan de cêdibe, Armanc pêwîst e li ser vê mesclê lêkollîn û hevpeyvînan çêke û sedemîn wanê sosyal bîne zîmîn. Ev tenê pirsek e, lê belê pirsên din ji hene.

Bi ditina min di zimanê Armancê de istîkrarek heye, lê belê ji bo xwendevanê Kurd zimanê wê giran e. Armanc kare hîn bi zimanekî hîsanî binivisine û gotinîn gel bi kar bîne. Hêla din ji nîvisen Armancê gelek dirêj in. Naveroka nîvisan lazîm e tije, lê kurt be. Ez bawer im redaksiyona Armancê wê van ditinê min bigre ber çavê xwe. Ez ji redaksiyona Armancê re di karê wanê gi-ran de serfirazî dixwazim.

Mueyîd Teyîb:

"Di derbareyê naverokê de, ez Armancê yek alî dibînim"

Ev meye eger ne abîdar e Kurmancî ye, ew qeder li kar e Ev tîfle eger ne nazenîn e Nûbar e, bi min qewî şêrîn e Ahmedê Xanî

Armancê 1sal 10 salen xwe tije kir. 10 sal di temenê rojname û kovarên cihanê de dibe ku wexte kurt be. Lê di temenê rojnameyaka Kurdi de wextek yekcar dirêj e. Ji ber ku di dîroka rojnameyaka Kurdi de, ew rojname û kovarên 10 salan li ser hev, bi awayekî rîk û pêk derketibin, mîrov dikare bi tîliyên destan bij-mîre.

Ez wekî xwendevanekî Armancê, Armancê ji destpêkê nas na-kim. Lê ji hejmara 62'an û pê de edî her hejmara wê ketiye destê min û ew meha ku nekeve destê min ez li pey digerim. Ez bawer dikim piraniya xwendevanê Armancê ji bi vî awayî li Armancê dinêrin. Û ev bi xwe ji nîşaneke ku vê rojnamê edî ciyê xwe di nav xwendevan de girtiye.

Bi giştî ez form û mîzanpaja Armancê baş dibînim; her çend hîn akincîbûneca(istîkrareka) dawî neketibe rûpelên wê ji.

Di derbareyê naverokê de, ez Armancê yek alî dibînim. Helbet rojnameyek siyasetek xwe ya teybeşî heye. Lê bi baweriya min û wekî ez di praktikê de ji dibînim, rojnameyek dikare "her çend girêdayî siyasetek ji be" çarçewa siyaseta xwe firehtir û rîbaza xwe ya ideolojîk kûrtir bike û xwe ji propaganda dîrek xelas.



Rûpelên hevpeyvînan, rûpelekî enteresant e. Kujiyê (quncikê Stirîyê Me) "yê ku Bavê Nazê destpêkiribû û Lawikê Berrîvanî didomîne" kujiyekî xweş e.

Li dawî, ez bi helkeftina 10 saliya Armancê germtirîn pîrozba-hîyên xwe pêşkêşî xwendevan, nîviskar û redaksiyona Armancê dikim û hêvidar im ku Armancê ji wek hemû Kurden pena-ber rojekê vegere welatê xwe û wê çaxê ne ji mehê carekê, her sibe çavê me bi rûpelên wê kevin.

"Ez Kurd im"

**Armanc di kongra
Enternasyonala
Sosyalîst de bi
Welîd Canpolat re û
bi Ingvar Carlsson
re peyivî**

A. Qasimlo
"Bi kêmanî
piştgiriya
tevgera
netewî
bikirana..."



Welîd Canpolat: "Ez Kurd im,
ji Kilisê me,
lê çi heyf
bi Kurdi nizanîm".



Hêro
Talabani:
"Ez hê ji
bawer
nakim,
çawa
dikarin
waha bikin"

Raporter:
A. Riza Alan
Foto: Eva Vaihinen

Kongra hijdan a Enternasyonala Sosyalîst di resolusyona xwe ya dawîn de bi nîv cumleyê cih da rewşa xelkê Kurd. Digel ku sê hêzên Kurdistanê mîvanên kongrê bûn...

Di kongrê de bi tenê Welîd Canpolat, Serekê Partiya Pêşverû ya Sosyalîst a Lubnanê, li ser rewşa Kurdistanê bi firehî sekinî. Serekwezirê Swêdê Ingvar Carlsson jî, bi kurtî û bi rûçikekî tirş, bersîva pirsên Armancê da.

Resolusyona Enternasyonala Sosyalîst di beşa "pirsên herêmî" de û di nav yek cumleyekê de hem cih dide pirsâ Afganistanê û hem ji pirsâ "eqeliyetîn" Kurd. Resolusyon weha dinivisine:

"...U zîlma li ser eqeliyêten Kurd weki rastiyek trajik dewam dike."

Çeken kîmyayı, şewitanîna çar hezar gundêñ Kurdistanâ Iraqê, surgûnkirina 1,5 milyon meriv û berî her tişti tevgera netewî ya xelkê Kurd li hember nijadperestî û dagirkeryê hatibûn "jibirkirin". Çima gelo? Me ji Ingvar Carlsson, Serekwezirê Swêdê, pirsî:

- Ingvar Carlsson, bikaranîna çekêñ kîmyayı li hember xelkê sivil li Kurdistanâ Iraqê di raya giştî ya cihanî de ev e saleke ku



Willy Brandt û Ingvar Carlsson di press konferansa dawîn a Enternasyonalê de ji bo ku li ser pirsâ Kurd ranewestin çiv didan xwe.

yek ji pirsên bingehîn ên mafêñ însanî ye. Gelo we çîma cih nedî vê pirsê?

- Me û partiyen din heta niha gelek caran cih daye vê pirsê. Û ev pirs êdi li her derê gelek eşkere bûye.

Resolusyona "piçûk"

- Şes meh berî niha hemû endamên Koma Miletan li Parîsê ji bo vê pirsê civîyan. Gelo vê pirsê di nav şes mehan de aktueliya xwe wenda kir. Dibe ku we ji bir kiribe ku di resolusyonê de cih bidinê?

- Na, me ji bir nekiriye, lê di resolusyonê piçûk de cihem hemû pirsan tuneye.

Resolusyona "piçûk" 16 rûpel e. Û gava ku Carlsson bersîva vê pirsê dide çivekê dide xwe û dixwaze tirşıya rûçikê xwe veşere. "Li qusû-

rê mîze neke" dibêje, "hevalîn televizyonê di dorê de ne." û bi tiliya xwe tîma televizyona Emerîkî, ku li kîleka me ye, şanî dide.

Ne tîma Emerîkî ne ji du sed rojnamevanêñ ku besdarê konferansa dawîn a Willy Brandt û Ingvar Carlsson bûn li ser pirsâ Kurd tiştek pirsin. Nîv pîrsan li ser İsrail û Filistinê û nîv din ji li ser pirsên çekdarî û aşitiya cihanî bûn...

"Ji tunebûnê çêtir e"

Di despêka kongrê de mîvanîn Kurd gelek bi hêvî bûn.

Mesûd Barzanî, ku li ser navê Eniya Kurdistanâ Iraqê hatibû, A. Qasimlo, ku li ser navê PDK'ê hatibû û Noşîrvan, ku li ser navê Ye-

kîtiya Niştimanî hatibû, wulo bawer dikirin ku kongra Enternasyonalê wê bi "kêmanî" piştgiriya xwe ji tevgera netewî ya Kurdistanê re nişan bide. Lê mixabin...

Pîstî resolusyonê, gava meriv di koridorêñ salona kongrê de rasti wan dihat, nerazibûna xwe derhal şanî didan, gazar dikirin, "lê disa ji" digotin, "ji tunebûnê çêtir e"

Mala camêr; Welid Canpolat avabe. Piça morale ku bi mîvanîn Kurd re mabû, wusa xuya bû, ku bi xêra serê wî bû. Hemûyan ji hev dipirsin: "Te li Canpolat guhdarî kir, ne wisa?". "Ji xwe" digotin, "camêr hat ji me pirsî, got hun ci dixwazîn ezê bêjim."

Bi rastî ji beşekî mezin a peyva Canpolat li ser pirsâ

Kurd bû. Canpolat piştî ku bi du-sê gotinan bahsa rewşa Rojhelata Navîn kir, bi kurtî got ku "Pirsên herêma Rojhelata Navîn bi hejmartinê xelas nabin. Ezê bi tenê li ser sê pirsên bingehîn rawestim: Lubnan, Filistin û xelkê Kurd"

Canpolat ji Sewrê û Lozane destpêkir. Rewşa Kurdistanâ Iraqê, gundêñ şewitandî, surgûnkirna milyonek Kurd û bikaranîna çekêñ kîmyayı yet bi yet izah kir.

Di dawiya peyva xwe de ji Enternasyonalê doz kir ku roja 16ê Adara 1988'an, roja ku Helebce bi çekêñ kîmyayı hat fetisandin, bibe roja navnetewî ya li dijî çekêñ kîmyayı.

"Ez ji Kilisê me"

Gelo di nav ewçend nûneran de çîma bi taybetî Canpolat li ser pirsâ Kurd rawestiya? Derdê wî çibû? Me ev pirs raste-rast jê kir:

- Derdê min ci bû?
- Belê.
- Ez Kurd im.
- Waa? Tu bi Kurdi zanî?
- Na, ci heyf... Bapîrê min ji zû ve koçi Lubnanê kirine.

- Ji ku derê?

- Ji Kurdistanâ Tirkîyê, ji bajarekî piçûk bi navê Kilisê.
- Baş e, weki Kurdeki ci alikariya te digihije xelkê te?

- Ji Kurdên Lubnanê re ci alikariya ku ji destê me bê em dikin. Em alikariya Kurdên din ji di rewşen weha de û di nav alema Ereban de bi qasî karîna xwe dikin.

- Ji xwe ez ne Kurd bûma ji, weki insanekî ji minê

Tesrîfa Kurmancî

Emin

Ev pirtûkek ji wan ên kevn e ku di mizgeft û hicrikên Kurdistanê de dihate xwendin. Sağırd û feqiyên Kurdan di destpêka serle (beşek ji gramera Erebî ye) de ew dixwendin û jiber dikirin.

Pir mixabin ku nivîskarê pirtûkê navê xwe û dema nivîsandina wê tê de nenivîsandiye. Lî li gor ku tê bîra min, di dema feqitye de, me carna jê re "Tesrîfa Mele Eli" ji digot. Di dawiya pirtûkê de bi tenê navê wi kesê ku vê pirtûkê ji bo şexsê xwe ji nû ve bi destê xwe nivîsandiye û dema wê nivîsandinê heye.

Bi navê "Tesrîfa Mele Eli" pirtûkek din ji bi Erebî heye. Ev Tesrif ji aliyê Eliyê kurê Şêx Hamidê İşnuyê (Şinoyi) ve hatiye nivîsandin. Ewî ev pirtûk wek şerhek li ser pirtûkeke ku bi navê "Tesrîfa Zencanî" tê bi nav kirin, çekiriye (peyva "Zencan" ji Zengan yan Zingan hatiye wergerandin bi bal Zencana Erebî ve). Li gor gotina wî ya di serê pirtûkê de, ewî Tesrîfa Zencanî him mane kiriye û him jî di hinek ciyan de lê zêde kiriye. De încar ku meriv herdu tesrifan dide ber hev û bala xwe didê, meriv dibê qey yan yek ji ya din hatiye wergerandin yan jî herdu ji destekî lê bi du zimanê (Kurdî û Erebî) cuda derketine. Lewra ji kurtayîya ya Kurdî pê ve tu cudayıya wan a berbiçav tuneye. Yanî ya Kurdî bi tenê beşek ji Tesrîfa Zencanî girtiye.

Ez bawer im ku wê binavkirina wan bi navê "Tesrif"ê ji ji vir bê.

Ew lêkolina ku di vi warî de ji aliyê Malmisanij ve hatiye kirin û di kovara Tirkî ya "Tarih ve Toplum" (Dîrok û Civak) de hatiye weşandin jî vê gotina min qewî dike. Lewra tê de tê gotin ku pirtûkeke Eli Teremaxî (Termûki) ku gramera Erebî bi zimanê Kurdî beyan dike, bi navê "Tesrif"ê heye û kitêba Eli Teremaxî (Termûki) ya bi navê "Serf û Be'zi Üsuli Lazimeyi Te'lîme bi Zimanê Kurmancî" li Leningradê di nav pirtûkên Kurdî yên destxet de heye.

Her çiqas li vir cudayıyek di paşnavî de hebe ji wek tê xuya-kirin Teremax (Termûk) û Şîno navêni di ciya ne li Kurdistanê. Heçika Termûk, li gor hin nivîskaran navê ciyek e ku dikeve navbera Hekari û Makû.

Li gor ku Ebdulreqîb Yûsuf di "Diwanâ Kirmancî" de dinivise, Teremax rasttir e. Ew wisa dinivise:

"Teremax gundekî 200 mal e, dikeve rojavayê nehiya Mukse. Çar saet ji tixübê qeza Hîzanê dûr e. Lî girêdayî Mukse ye. Ev gundê han dikeve jér qeraxên ciyayê Nanikasê û piştâ ciyayê Amxewse û gundê Zerdas dikeve pêsiya Tere-maxe."

Incar dibe ku Mele Eli li van her du (yan ku Termûk û Teremax du ciyên cuda bin her sê) ciyan jî jiyabe û xwe li wê goriyê paşnav kiribe. Yan jî xelkê wer ew paşnav kiribe. Lî li vir ya ku ez xwe pê ve digrim

rewşa wan û bingehê wan bi awakî fireh û dûvedirêj bi xwendevanê xwe dide zanîn.

Li vir tiştek bala meriv dikşîne û pirsek tê bîra meriv: Ka gelo çima nivîskarê me (ger ku yek be) di pirtûka Erebî de xwe bi xwendevanan bi bav û bi cih daye naskirin lê di ya Kurdi de qet xwe eşkere neki-riye? Ev yek, tade û koteka ku li ser gelê Kurd û çand û zimanê wî ji aliyê neyarê wî ve tê kîrin, ne bes vêga belki domandina wan ya ji hingê ve, tîne ber zêhna meriv.

Ev çend rêz ji rûpela pêşin a Tesrîfa Kurmancî ne ku ji tipen Erebî hatine wergerandin:

"Îlem": Tu bizan, ey mu-fredê muzekkerê muxate-be zihni ye.

"Enne't-tesrîfe bî't-teh-qîq": Heçika m'ena levzê tesrifê ye.

"Fî'l-luxê": Di luxetê Erebân de.

"Et-texyîrû": Texyîr e. Texyîr ciye?

"Îhdasu şey'in": Peydakirina şey'eki ye.

"Lem yekun qeblehu": Tunebî ji berya wî.

"Ke'1-kîtabet 'ele'l-qîrasî we'l-selcî 'ele'l-cebelî": Herwekî nivîsandinâ li ser kaxid û berfa li ser ciya.

"Ke fl'sina'eti": Heçika me'na levzê tesrifê di "si-na'et" da yanî di "îstilaha serfiyan" da

"Tehwilu'l-eslî'l-wahidî": Wergerandina eslê wahid e ku mesder e.

"Îla emsîletîn mux-telîfetîn": Bi bal hindeki emsîlen muxtelife ve.

"Emsîlen muxtelife" ci ne? Ku mazî, muzarı', emîr, nehî ye, ismûfa'il e, ismûmef'ul, sifetu'l-mu-şebbihe ye, ef'alü't-tefdil, ismû'z-zeman, ismûmekan (û) ismûalet e.

Ji bo ci?

"Lî me'anîn meqsûdetîn": Ji bo hindeki me'anîyên meqsûde.

"La tehsilû": Hasil nabin ew me'anîyên meqsûde.

"Îlla bîha": Îlla bi wan emsîlen muxtelife.

"Îlem": Emr e. Emir xas e, xîtab 'am e. Şamil e ji bo kullê "men yeqreû we yesme'û".

Uzir

Hejmara berê, di rûpela 8'an de me navê çiroka Ezîz Nesîn xelet nivîsandiye. Rastiya wê Çete ye.

Lawikê Berrîvanî

Deng Siyaopîng ne melê Kurd e!

Piştî qetîlama li Meydana Tienanmen ez û hevalê bînfireh li ser bûyerên vê dawiyê li Çinê bûn dipeyivîn. Hevalê min ê bînfireh got:

-Tu rastiyê bixwazî teleban pirr bêsebrî kirin, dibê hinekî din jî bipana heta ku Xwedê Teala ruhê Deng Siyaopîng digit.

Li hember vê dîtina hevalê xwe yê bînfireh min got: "lê tu dizanî ku bîna Xwedê pirr fire ye, sebra wî ya herfî kin hezar sal e".

Hevalê min gotina min birrî:

-Henek li alîkî, lê rastî Çinî mîletekî xwedî fantazî û pirr bi sebr in. Meriv dikare bêje ku sebra Eyûbê Kurmaxwarî li ba wan heye. Lî nizanim çima di vê bûyera davî de telebe ji vê tradisyonê derketin. Li ser bêsinoriya fantazî û sebra wan ezê ji te re çiroke wan bibejim:

Tung Fao merivekî pirr feqîr bû. Rojekê hêkek xelat danê. Kêfa wî pirr ji hêkê re hat; ji bo ku xelata xwe nîşanî pîreka xwe jî bide bazda çû malê. Ji pîreka xwe re got: "Xatûn xatûn, hela tu li vê hêkê mîze ke! Emê êdî dewlemend bibin. Hêkek xelat dan min".

Jinikê got: "Xelat dane te baş e, lê îcar ku emê pê dewlemend bibin qet nakeve serê min".

Tung Fao murûzê xwe tirş kir, got: "Jinê di serê te de jî qet aqil tuneye ku! Nuha baş guh bide min: Ezê vê hêkê têxim bin qurpa cîranê me. Piştî ku mirîşkê çèle derxistin ezê çêlikekê ji nav wan bigrim. Ev çêlik wê mezîn bibe, bibe mirîşk û wê ji me re gelek hêk bike. Ji wan hêkan jî wê gelek çêlik çê bibin. Çêlikên bibin mirîşk û wê ji me re hêkan bikin. Ü bi vî hawî wê dom bike. Rojekê bê wê gelek mirîşk û hêkên me çê bibin, emê wan bifroşin û bi perên wan ji xwe re mangekê bikrin. Manegey gelek golik bizê, golikên mezîn bibin, bibin mange. Bi firotina golik û mangan di nav çend salan de emê perakî wer qezenc bikin, ku emê kari-bin ji xwe re perçak erd û xaniyekî bikrin. Ji sisîyan duduyê peran emê ji bo kirîna erd û xêni mesref bikin, ji sisîyan yekê peran ez dibêm emê ji xwe re pê serpiyê xwe nuh bikin û hin tişti miş ji malê re bikrin. Piştî van mesrefan dibe ku hinek pere jî ji ber bimîne. Bi van perên mayî ji ez dikarim ji xwe re cariyeke narîn û xweşik bixwazim".

Di cî de barrîn bi jinikê ket, got: "Ero anuha te nît xera kiriye ku ji xwe re cariyeke bînî ha! Bi wî Xwedayê ez xulq kirime, ji asîmanan kevir jî bibare min nehişt nigê wê bi hundur bibe...

Weha got û hêka di destê mîrik de ji destâ girt, got cilq û li erdê xist. A teleban jî wek jina Tung Fao bêsebrî kirin.

Min got, na ne weha ye. De tu bise ez jî ji te re meselak Kurdî bibejim:

Lawê mîrik bala xwe dayê ku mele bi diya wî re ye. Carek du car... çû ji bavê xwe re got. Got, "Bavo welle mele bi diya min re ye".

Bavê got: "Lawê min Xwedê jê re nahêle".

Lîwik her çiqas çend carê din jî ji bavê xwe re got jî pere nekir. Bavê tim got, "Lawê min Xwedê jê re nahêle".

Lawikê reben dît ku heger bi bavê û bi Xwedê bimîne mele wê qûşê li diya wî bigetîne. Sibake ku mele derketibû azana sibê, lîwik çû hinik nok bi ser nêrdiwanâ (derencen) minarê reşand. Qapqap di nigê melê de bû; piştî ku azan qedand û xwe bera jér da, ji ber ku hundur minarê jî tarî bû nok nedîn, nigê wî şemîti û ser serî di jér wer bû; heta binê minarê lox bû û mir. Lawik reviya ba bavê xwe, got:

-Bavo mele mir!

Bavê got: "Lawê min, min ji te re negot Xwedê jê re nahêle..."

Lîwik: "Bavo, welle heger ku min alîkariya Xwedê nekira meleyê hîn gelek caran qûş li diya min bi getanda.

Hevalê minê bînfireh got: "Ev jî fikrek e. Lî divê tu bizanibî ku Deng Siyaopîng ne melê Kurd e, der-nakeve ser minarê û azanê naxwîne. Ji bo vê jî wê hîn demek dûr û dirêj qûşê li diya "lêwik!" bigetîne...

Bîranînê Têkoşerekî Kurd

Ehmedê Abdurehman Axayê
kurê Şahîn Axa
-3-

Evaye çîroka jîna min ji ewelê
umrê min heya tarîxa sala 1976

Xebata me ya Xoybûnê li Tirkîyê

Du roja piştî wê, ji me re gotin "divê hûn kefil bidin emê hewe berdin". Me ji wan re got "em kesekî nas nakin heya bibe kefilê me". Ji me re gotin "yan divê hûn kefil bidin yan kifaleta şexsî bidin". Me ji wan re got "em kefaleta şexsî bidin". Rabûn sened li ser me nivisîn, me her çara ìmza kir. Reşbelkekê ji dane ji bo qaymeqamê Zaxo. Senedê de nivisibûn ku eger hûn neçin Zaxo cem qaymeqam hukmat wê hewe bigre şes meha hepis bike û 1000 rûpî ceza ji hewe bissîne. Me qebûl kir, reşbelek dane me ji qaymeqam re. Me reşbelek vekir. Têde nivisibûn ku "Şêx Abdurehman digel hevalê wî li Erbilê girtibûn. Tu ewraqên sibûti bi wan re tunebû. Mala wî li gundê Balqûsse ye, divê bê izna mudûrê nehiyê ji gund dernekevin".

Pişt re em çûn Zaxo, cem qaymeqam, ji me re got "divê hûn li gundê Balqûsse bisekinin, bê izna mudûrê nehiyê ji gund dernekevin". Me jê re got "ser sera", em ji Zaxo çûn gundê Balqûsse. Çar rojan em mane li gund, me cejna xwe li wir kir.

Roja piştî cejnê Şêx ji min re got: "here cem mudûrê nehiyê gundê Asîhê nêzîkî geliyê Zaxo. Jê re bêje bila izna me bide, em herin gundê Çiftlikê ji bo cejna Şêx İbrahim Heqî." Ez çûm cem mudûrê nehiyê, min izin jê xwest. Ji min re got: "dudo herin ziyareta Şêx û dudo bimînin, heya ew vegeerin herduyên mayîn bila herin." Min hêvî jê kir ku emê her çar herin. Qebûl nekir. Min jê re got: "weki em her çar herin tê ci bikî?" Li min vegerand: "hûn çûn çûn, ez izna hewe nadim". Ez vegeriyam cem hevalan, min ji wan re got. Şêx Ebdilrehim got: "nalet li wan be, rabin em herin gundê Çiftligê cejna Şêx." Em bi peyatî rêve çûn heta gundê Çiftligê, sê roja mane li cem Şêx İbrahim Heqî. Pişt bi lingan meşin çûne Sûriyê. Ji beriya em herin gundê Çiftligê me Osman Sebîr rê kir Barzan cem Mela Mistafa. Ez, Şêx Ebdurehman û Mistafa Ehmedê Botî çûne Sûriyê. Ji Iraqê heyya Eyarê(Gulanê) sala 1931 em çûn gundê Tildarê. Em li mala Mele İbrahim disekinîn, xwari-na me ji mala wî bî. Mela İbrahim zilamekî pir qenc bû, Xwedê rehma xwe li bîke me gelek nanê wî xwar.

Pişt re em rî ketin çûn riya ku çiyayê Cûdi re diçû, me hê xelas nekiri bî, sibe dinya ronahî bî. Me xwe di çiyayê Cûdi de veşart heya mexribê, em çûn ber ava Hîzîl em derbas bûn, ketin Iraqê. Em çûn Zaxo. Li Zaxo em man 20 rojan, me xe-batek hêja kir. Pişt re em çûn Mûsilî, 10 rojan mane li vê dê, pişt re em çûne Sûriyê, gundê Banegesrê.

Me reşbelek ji Xoybûnê re rî kir, tiştî ligel me çêbin me hemî tê de ji wa re beyan kir. Piştî çend rojekî Xoybûnê cewaba reşbeleka me rî kir. Di reşbelekê de nivisi bûn ku tiştîn we ni-visî hemî me zanî, Yezdanê pak alikarê we be, em ji we sipas dîkin, em hewe jîbir nakin.

Piştî mehekê dîsa Xoybûnê reşbelek ji me re şiyand: "ewa ye me çend neşre ji hewe re rî kirin digel mohra Xoybûnê. Hûn herin Tirkîyê. me bihistiye Arif Beg û Adil Beg-herdu birayê hev in ji gundê Miksê ne-ji ber Tirka revîne çûne Iranê ji Iranê bi dizi hatine Tirkîyê. Herin wan bibinin, tev de riya postê vekin ji Tirkîyê heya Iranê, ji Tirkîyê heya Sûriyê û Iraqê. Hûn arîkariya hev bikin û xebatê di Tirkîyê de bikin, miletê Kurd şiyar bikin. Em pir ji we sipas dîkin Yezdanê pak arîkarê we be."

Dema me reşbeleka Xoybûnê xwend me 9 zilama xwe kar kir: 1) Şêx Ebdurehman Garîsi 2) Ehmedê Ebdurehman Şazî 3) Şeref Sultanê Hesen 4) Elî Golçî 5) Elî Hemîd 6) Lawîk Berwarî. Hersêyê din Ermenî bûn, serekê wan navê wî Azad bî, peyakî zor zana bû. Wê bi me rebihata heya tixûbê Iranê, ji wir pê de wê biçûna Iranê. Me xwe di rest û fişekan de piça, em çûn gundê Dêrika ber ava Dicle. Dinya heyya Çiriya Paşiyê bû. Me ji muxtarê gund re got: "dema vegekir ji Tirkîyê emê cewabê bidin te, çend zilama rîki ber avê arîkariya me bikin, ji avê me derbas bikin milê Sûriyê. Ji me re got: "ser serî min." Bibû şev, me li ava Dicle da em çûne Tirkîyê. Bi roj em xwe vedîşerîn û bi şev em dimeşin. Çar şeva heya em gîhiştin qeza Xassî. Berf li me barî, çiya asê bûn me nikarî em herin tixûbê Iranê cem Adil Beg û birayê wî Arif Beg, em vege-riyam, çar şeva meşin heya gîhiştin ber ava Dicle. Rastdoka ber avê qereqola

Tirka nêzîkê me ye. Şêx Ebdurehman digel hevala ji min re gotin: "tu soberiyê zanî, divê tu heri cem muxtar da çend zilama ji me re rî ke, me ji avê derbas bîkin. Eger em bimînin li vir heya sibehî, em û qereqola Tirka şer bikin pîrr ji me re xirab e." Min ji hevala re got: "ser çavê min ezê herim." Min xwe li avê da derbas bûm çûm Dêrikê ber de-riyê muxtar. Min destê xwe li deri da, muxtar ji xew şiyar bû, min jê re got: "Şêx Ebdurehman silava li te dike, dibêje çend zilama rîke da arîkariya me bikin, me ji avê derbas bîkin." Ji min re got: "Eger Peyxember li ber avê be kes nahê wî ji avê derbas nake." Min jê re got: "serî zilamê ezê 20 me-cidiya bidim wan." Li min vegerand: "serî zilama tu 100 me-cidiya jî bidî kes nahê. Çimki dinya serma ye, erd qerisiye." Ez bêhêvi ve-ge-riyam çûme ber ava Dicle, min ba kir hevala ku kes nahê hewe ji avê derbas nake. Şêx ji min re got: "la-zim e tu arîkariya me bikî." Min gazi hevala kir: "xwe hazir bikin ez hatim." Min li avê da ez derbas bûm çûm cem hevala. Ji min re gotin: "em nizanîn soberiyê, divê tu tivingê me hêlgirî." Min ji wan re got: "ser serî min." Heş tiveng min danî ser piştâ xwe ez ketim pêsi-ya wan, me li avê da av bûrî bû, em meşin ma nêzîkî 10 mitra em ji avê derbas bîbin ez noq bûm di avê de, avê ser min re avêt, min soberî kir, lingên min ji erdê girt, ez meşim bi lez derbas bûm ji avê. Min her heş tiveng avêtin erdê, li hevala vege-riyam. Heval hemû ketibûn bin avê, min li wan rîni yek ji hevalan min nedît, ji nişkave hemû heval bi ser avê ketin, em hemî ji avê derbas bûn bi selameti em çûn gundê Dêrika ber avê, mala Hecî Reşid. Ma-leke pir hêja bû agirê dara ji me re kirin, em germ bûn. Nêzîkî fecrî bî, min ji Hecî Reşid re got: "ez wes-tiya me. Cihê min çêke ez razêm." Min xwe êxist bin lihevê de. Ahaliyê gund ha-tin cem hevala ji wan re gotin: "kê hûn ji avê derbas kirin." Hevala li wan vege-randin: "hevalê me Ehmedê Şazî sê cara li avê de em derbas kirin." Gundiya ji hev re gotin bi Xwedê ewê bimre, madem sê cara li avê daye ji serma rûviyê wî qetiyane. Di bin lihêse de ez guhdarî wan dikim, min li wan vegerand: "hûn derewa

dîkin, ez nizanîm min li avê daye ya nedaye."

Sibehî em çûn gundê Banegesrê li wir sekinîn. Me neşre dînivisîn, mora Xoybûnê lê dida, belav dikirin. Me neşre rîdikirin Tirkîyê û Iraqê. Me pir xebat dikir. Me ci bikira me rîdikir ji Xoybûnê re heya sala 1932.

Xoybûnê reşbelek ji me re rî kir di sala 1932 di heyya Hezîranê de, ku Arif Beg û Adil Beg herdu digel hevalen xwe hatine Tirkîyê dora gundê Miksê, nêzîkî tixûbê Iranê hin hevalen wa Ermenî ne. Divê hûn herin wa bibînin. Ewaye me reşbelek di nav reşbeleka ku me ji hewe re rîkirî hûn nîşa Arif Beg û Adil Beg bidin hûn hev nasbi-kin. Ew reşbelek jorê wê bi Kurdi nivisibû binê wê bi Ermenî nivisî bû, mora Xoybûnê û mora partiya Taşnaq lê dabûn. Ji me re di reşbelkê de nivisibûn ku "me ji hewe dibê hûn ka-reki mezin bikin, weka me ji hewe re gotibû sala bûrî. Hûn riya postê vekin ji Tirkîyê heya Iranê, ji Tirkîyê heya Sûriyê û Iraqê, em geleki ji hewe sipas dîkin û Yezdanê pak arîkarê hewe bî."

Neh zilama xwe kar kir, me rî kir gundê Hewrêzkê cem Livon Paşayê Ermenî yê Taşnaq li Iraqê ku "tu hersê zilamên xwe bişini Sûriyê, gundê Banegesrê." Piştî çar roja hersê zilam hatin, me hemîya xwe tev de pêkanî çûne ber ava Dicle me bertîl da qereqola Tirka li gundê Ribehiyê. Bi şev em ji avê derbas bûn ketin Tirkîyê de, em meşin çûn heya gundê Érs. Nava gundiya de dubendi bû. Şêx Ebdurehman sulhiyeta wan kir, li hev hatin, çûn rûyê hev maç kirin. Ji Érs em çûne nav eşîra Garisa; eşîra Şêx Ebdurehman. Di nav wan de jî dubendi bû. Me ew jî li hev anîn çûn rûyê hev maç kirin. Ji wir pê de em çûn gundê Coli-çemka. Roj û şevekê em mane li Coli-çemka. Ji wir pê de em pênc şevan meşin heya em gihaştin gundê Sempanis. Navê muxtarê gund Şahîn bû. Em li piştâ gund sekînîn, me qasidê xwe rî kir cem muxtar, hat cem me, destê Şêx maç kir; me jê pîrsî: "Arif Beg û Adil Beg li cem te ne?" Li me vegerand: "Ewaye çar roj e ji cem me çûne, çûne gundê Arincê, cem muxtarê gund Osmanê Endelib."

(Dom dike)

Sekreterê Giştî yê Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan Serhad Dîcle:

"Mesela birêkxistina milet, me hemû hêzên milet e"

-II-

Pirs: Qasî ku xwiya ye, mesela çareserkirina yekîtiya çîna-yetî hatiye li noxtêkê rawesiyaye, ji bîlî vê, li welatê me meseleyek din a welatperwer û sosyalîstan heye, avêtina ga-vêr müşterek ber bi armancêr diyarkirî. Berî 12'ê îlonê, tecrûba UDG (Yekîtiya Mili ya Demokratîk) çêbû, piştre jî ya 5 rêxistinan (Ala Rzigarî, KUK, Têkoşîn, PSK-T û PPKK) çêbû ku jê re HEVKARî dihat gotin. Pişti xebatek zehmet û dûr û dirêj avabûna TEVGER'ê hat îlankirin. Di nav hêzên siyasi de, pişti tecrûba UDG û HEVKARî'ye, hin endîse ber bi TEVGER'ê de jî çedîbin. Hin endîse hene ku gelo TEVGER wê bersîva hin hêviyên ku iro he-ne bide yan na, gelo di rewşa iroyin a welat de wê bibe hê-zek maddî yan na: Gelo meriv dikare çewa ji van endîsan bê xelaskirin?

Bersîv: Rastiye e, ku hin hêvî ji TEVGER'ê têr kirin. Berî her tiştî, hêzên ku TEVGER ava kirine, vê hêviyê jê di-kin. Helbet ji bo biserxistina van hêviyan me TEVGER ava kir, programek hat hazirkirin. Helbet têkiliya ku TEVGER wê çiqasî karibe van hêviya bi ser xe, bi xebatêni ji bo yekîtiye yêne kevn heye, lê divê em hemûyan nekin wek hev.

Di esasê xwe de, qeneeta min ew e ku divê meriv nebêje ku karûbarêni ji bo yekîtiye yêne berê ji bi çu kêrê nehatin. Berî 12'ê îlonê, UDG bi wê kêrê hat ku hin gav bêne avêtin. Têzanîn ku UDG, ji sê hêzên pêk dihat (alîgîrîn PPKK, PSKT û KUK'ê). Helbet ev yekîtiye teng bû, divê hin hêzên din jî bigirta nav xwe. Lê ji ber sedemîn subjektif ên wê demê û dilmanîyan û pêşînhukmiyê teng ma. Ev kêmâsiye bû. Hin armancêr dûr û dirêj dabûn pêşîya xwe, di vî warî de jî bi ser neket, zû belav bû. Lê tevî van kêmâsiyan jî UDG rolek baş û bikêrhatî list di mesela bihevrekarkirina sê hêzân de ji bo demekê, xizmeta peydabûna exlaqê karkirina bi hev re kir. Heta, dibe ku li ser nehatibe sekinandin jî, divê em qebûlbikin di nêzîkbûna KUK û PPKK'ê de gava pêşîn UDG ye. Berê, heq ya ne heq, di navbera me de dijminatiye hebû, lê di riya UDG'ê re, ev

rabû, nêzîkbûna ber bi têkil-yen qenc ve dest pê kir.

Ji alî din buyera UDG'ê gava pişti 12'ê îlonê me dest bi HEVKARî'ye kir, ji bo me bû tecrûbeyek. HEVKARî, wek tê zanîn, di qonaxa amadekirinê de ma, program jî hat çêkirin lê tu carî nagîhişt qonaxa avabûnê. Tevî vê jî di dema HEVKARî'ye de van her pênc partî û rêxistinan ji alîki de hazırlaya avakirina yekîtiye dikirin, ji alîki de jî di bin tesîra nêzîkkirina vêde, di gelek waran de mewqufî muşterek hat girtin, karên muşterek hatin kîrin.

Pişti demek kurt a miyawela avakirina HEVKARî'ye, ji bo yekîtiye dîsan kar û xebatê dest pê kir û di encama vê de TEVGER hat danîn. Di eslê xwe de, di avakirina TEVGER'ê

Li Kurdistanê, parti û rêxistinêni cihê hene ku ne wek hev difikirin, li cihê cuda cih girtine. Lê di navbera wan de gelek noxtêni muşterek hene. Me ji xwe re kiriye armancu em di noxtêni muşterek de bigihê hev, hêzên xwe bikin yek, bi hev re mudaxeleyî berpirsyariyên qonaxa iroyin bikin, têkoşîna TEVGER'ê, iro destpêkek e. Ji bo ku destpêk e, hê gelek kêmâsiyên wê hene, zeîf e û rêxistinêni piçûk e. Lê ji xwe hemû destpêk jî weha ne.

de rola kar û barê ji bo HEVKARî'ye û ya programê ku ji bo wê hatibû hazirkirin gelek e.

Li Kurdistanê, parti û rêxistinêni cihê hene ku ne wek hev difikirin, li cihê cuda cih girtine. Lê di navbera wan de gelek noxtêni muşterek hene. Me ji xwe re kiriye armancu em di noxtêni muşterek de bigihê hev, hêzên xwe bikin yek, bi hev re mudaxeleyî berpirsyariyên qonaxa iroyin bikin, têkoşîna TEVGER'ê, iro destpêkek e. Ji bo ku destpêk e, hê gelek kêmâsiyên wê hene, zeîf e û rêxistinêni piçûk e. Lê ji

xwe hemû destpêk jî weha ne. Ji gava pêştirin meriv destpêdike û têkoşîn gav bi gav tê pêşdexistin, tê gihadina wê qonaxa ku karibe rola xwe ya esasî bilize. Di vê manê de, ez TEVGER'ê pêşdetirin gav dibînim ku li welatê me heta iro hatiye avêtin. Ger em bi istrar û bi qerardaşî li ser riya armancêr xwe bi meşin, sedem nîn in ku TEVGER xurt û berfireh nebe.

Hêzên ku iro TEVGER damezrandine, li gor taqet û imkanen xwe ew bi rê xistine. Rêxistin, kadir û kesen welatperwer ên ku li dervayî TEVGER'ê ne, helbet mesela rizgariya gelê Kurdistanê, mesela wan e jî. Divê ew jî serê xwe bişînin ka gelo têkoşîna vî milleti wê çawa bê pêşdexistin. Gava serê xwe êşandin, mecbûr in ku heqîqeta hebûna TEVGER'ê ber çavan bigrin bifikirin, munaqeşe bikin ka gelo me'na vê hebûnê çiye û wê mewqifekî bigrin. Gava em bi vî çavî lê binêrin, meriv dikare bêje ku TEVGER ji bo wan jî pêşdetirin gav e ku hatiye avêtin. Fikra min ew e ku, ew jî divê mil bidin vê gavê miyaweli xwe pê re bikin yek.

Pirs: Tu zanî ku, di programê hemû rêxistinêni siyasi yêne ku TEVGER ava kirine de, tê diyarkirin ku "rizgariya netewî mesela avakirina cephekê ye". Lê pişti ew qas sal ku hênuh dibêjin "me fam kir ku ev kar bi hev re kare bê meşandin" dibe sedemê hin endîsan: Tê gotin ku gelo iro ev ji bo ku qels bûnê, derb xwarine, loma dixwazin bi hev re karûbar bikin, yan gelo bi rastî jî dixwazin berê hêzên xwe bi hev re bidin dijmin? Endîse û şikek wiha heye. Tu ji vê yekê re dibêjî ci?

Bersîv: Di esasê xwe de ez ne di wê baweriye de me ku hênuh ferq kirine ku nikarin bi serê xwe karûbarekî mezin bikin. Tiştê ez dizanim, hema hemû partî û rêxistin, tevî ku ew wekî partiyekê hatine avakirin ji, fikra vê yekê li cem wan e ku têkoşîna rizgariya gelê Kurd ne bes bi xebata wan tenê, lê bi ya muşterek a partî û hêzên li dervayî wan ji bi ya çin û tebeqe û temsîkaren wan jî wê bê dayîn. Di programa me de jî ev yek eşkere ye. Ü nişana berbiçav a vê baweriye UDG ye ku berî 12'ê

îlonê hat avakirin.

Lê hema em bêjin ku pişti buyerên 12'ê îlonê ku mesela yekîtiye hin xuyanîtir û ferzir bû, ew hêzên ku berê geleki behsa yekîtiye nedikirin, iro zêdetir dengê yekîtiye ji wan derkeve, ma gelo ev zeîf ye, yan encamek e ku guhertina rewşî bi xwe re anîye? Ci dibe bila bibe, yekîtiye li ser hêzan hê bêtir xwe ferz kiriye.

Jê pêştir ew pîrsa ku dibê ev ji ber qelsbûn û zeîfbûna xwe

Mesela birêkxistina milet, mesela yekki-rin û birêkxistina hemû hêzên milet e. Helbet ne mumkun e ku hemû hêzên milet di nav partiyekê de bigihê hev. Jê pêştir ev ne karekî rast û durust e jî. Rastî ci ye? Rastî ew e ku partî û rêxistinêni cihê werin cem hev, hêzên xwe bikin yek û di platformekê de têkoşîna muşterek bidin.

behsa yekîtiye dikin, li gor baweriya min ne pirsek e ku netîca fîkr û munaqeşeyeka dûr û dirêj û bi serûberiyê ye. Ma zeîf çiye? Heta derekê, partiyek bi serê xwe hergav zeîf e. Di bihêzîrîn dema xwe de jî partiyek bi tenê zeîf e. Em partiya xwe bifikirin: ger em bala xwe bidin berfrihî û çarçova têkoşînê, em bêjin ku iro partiya me hemû çîna kirêkar li pey xwe bimeşanda ji, bi serê xwe bes têkoşîna çîna karkir li Kurdistanê zeîf e, qels e. Divê têkoşîna rêxistinî ya çîna karkir bi ya zehmetkêş, çîn û tebeqên din re ku di bin zulma milî de ne, bibe yek. Zeîf ne bes taybetiyek (xusûsiyetek) roja iro ye, sibê jî partiyek çiqas xurtbe jî wê nikaribe hemû çîn û tebeqan bi rêxe, wê nikaribe li hemû cî û warêni Kurdistanê hebe. Yanî ne tiştêkî ecêb e ku partî hay ji zeîfîya xwe hebin û loma jî hêzên xwe bikin yek. Ji xwe em bi tena xwe zeîf in, loma em dibêjin ku bi hev re kar bikin, têkoşînek muşterek ava bikin.

Lê bi wê qestê bê gotin ku, iro zeîf in, sibê xurt bibin wê

karê yekîtiye bi alîki de bidin, bes ji bo roja iro mesela yekîtiye bi kar tînin, helbet fikrek wiha jî gelek çewt e. Eger niyet ev be gelek şâş e.

Mesela birêkxistina milet, mesela yekkirin û birêkxistina hemû hêzên milet e. Helbet ne mumkun e ku hemû hêzên milet di nav partiyekê de bigihê hev. Jê pêştir ev ne karekî rast û durust e jî. Rastî ci ye? Rastî ew e ku partî û rêxistinêni cihê werin cem hev, hêzên xwe bikin yek û di platformekê de têkoşîna muşterek bidin.

Gava em li TEVGER'ê binêrin, xuya dibe ku em nefikirine ku bes partiyen zeîf bigihînin hev. Iro hemû partî, rêxistin û grubêni ku li Kurdistanê hene, hemû jî di TEVGER'ê de bigihê hev, ji bo biserxistina têkoşîna rizgariya gelê Kurd ev ne bes e. Bi milyonan kesen bê rêxistin wê hîn li dervayî têkoşînê bimîn. Loma divê em rê û dirbêñ wê yekê jî bibîn ku, bi milyonan insanen bê rêxistin jî bînîn nav refîn têkoşînê. Li gor vê yekê, ku bala we kişandibe, tê dîtin ku TEVGER'ê bes hedfa yekkirina partiyen siyasi nedaye ber xwe. Ji bîlî wan, rêxistinêni civakî, kesen ne endamên partiyen jî li gor destûrê dikarin di nav TEVGER'ê de cih bigrin. TEVGER'ê negotiye ku bi milyonan insan pêşiyê bira herin bibin endamê partiyekê ku karibin bibin endamê TEVGER'ê, perspektifekî hê firehtir hatiye dîtin, hatiye gotin ku endamnebûna bi milyonanan insan di partiyekê de divê rê li ber wê yekê negire ku werin ciyê xwe di TEVGER'ê de bigirin. Bir û baweriye kiriye li cem TEVGER'ê heye. Bi kurtî mesele ne bes girêdayî ye bi yeko yeko rêxistin, têkiliya wê bi hemû rêxistin heye, mesela birêkxistin tevgerek netewayî ye.

Pirs: Jiyanek li dervayî me heye, her roj em pêrgîyî gelek pîrs û pirsgirêkan têr. Ji bo tayîkirina rojeva siyasi hûn mudaxeleyî çawa çêtir dibînin? Yanî him wek partî û him jî wek TEVGER'ê hûn dikarin bi ci rengî mudaxeleyî qonaxê bikin.

Bersîv: Rastiye e ku tevgera Kurd iro li gor cih û wextê nikare mudaxeleyî buyerên siyasi bike, em hemû vê yekê

sela yekkîrin û birêkxistina

dibînin. Ev girêdayî bi dereca xurtbûna rewşa me ya rêxistinî ye. Pişti 12'ê Îlonê derbêngiran li rêxistinê Kurd ketin, bêhazirî hatin girtin, nikaribûn xwe li hember êrîşen diktatoriye biparêzin, loma jî zeîf ketin. Rewşa bêhaziriyê iro jî dom dike. Bibê nebê ev yek tesîrê li TEVGER'ê jî dike. Bêguman, wek yekîtiya heşt rêxistinan, îmkana mudaxelekirina TEVGER'ê ji ya hêzekê bi tenê zêdetir e. Lê di dawîya dawî de ev bi hêza van rêxistinan ve girêdayî ye.

Pirs: Baş e, di rewşek wiha de rast e ku em li hember sefbesbûna (duberiya) li dervayî xwe xemsariyê bikin, em bêjîn têkiliya me bi rojeva vê rewşê nîne?

Bersîv: Helbet ne rast e. Dixwazî bira li dervayî me be yan na, em di nav de cîh bigrin yan negirin, hemû buyerên civakî û siyasî, yêr rojane bi vî yan wî awayî tesîrê li me û li ser rewşa gelê Kurd dike. Tesîr dike ku têkoşîna wî, bi pêş yan paş keve, li ser riya rast an şabimeşe û hwd. Loma jî mesele li dervayî me bin jî divê mewqufekî meriv hebe. Lê tiştek heye; pir hêsan e ku meriv bêbêje divê meriv mewquf bigre, ya esasî ew e ku meriv karibe mewqufekî bide girtin.

Wek mîsal: iro bi tevayî me hemû partî û rêxistinê Kurdistanê, yan jî TEVGER'ê armançek dûr û dirêj daye ber xwe: Me gotiye ku xelasiya gelê Kurd bi avabûna Kurdistanek serbixwe û demokratik; bi ta-yînkirina qedera xwe bi destê xwe pêk tê û em jî bo vê yekî têkoşînê didin. Ev armançek dûr û dirêj e, ji iro heta sibê wê bi cîh nebe. Heta em bigihîn wê rojê him gelek mesafe û him jî wexteke dirêj heye.

Lê iro ne bi mena serxwebûnê lê bi mena nebûn û hebûna gelê Kurd, dayina hin mafêñ demokratik ên gelê Kurd, serbestkirina zimanê Kurdî, mesela Kurd li Tirkîyê aktuel buye, ketiye rojevê. Wekî din jî di çerçeve milî û çinayeti de li ser gelek maf û azadiyêñ aborî, siyasî; li ser demokrasiyê gelek tişt aktuel in ku têkiliya wan bi gelê Kurd jî heye. Gava em bala xwe bidinê, tê dîtin ku tevgera Kurd li gor berjewendiyêñ gelê Kurd nikare mewqufekî bistîne ku karibe raste rast mudaxaleyî van pîrsan bike.

Ev yek, helbet ji alîkî de jî ji bîr û baweriyêñ cîhê tê, ku di

vî warî de hene. Hin rêxistin hene ku, problemen wiha na-fikirin, serê xwe li ser wan na-êşîn, heta bi her awayî xwe dûrî wan dike. Lî li alî din hin jî hene ku hay ji giringiya buyerên siyasî yêr wiha hene û di-xwazin tesîrekê li van buyeran bikin lê taqeta wan têrê nake. A kurtî, di her du halan de jî tevgera Kurd di meselê de ne xwedan insiyatîf û mudaxele ye.

Tu ji min bipirsî, bi xwe ez ne bi wê fikrê re me ku dibêje divê meriv di buyerên rojane de ne xwedan mudaxele û insiyatîf be.

Dibe ku peyvîn fikrîn wiha gelek bi meriv xweş bin, tûj û şoreşgîr bêñ xwiyakirin: yêr wiha dikarin bêjîn ku de ci yanî mesela Kurdan tê munaqşekirin? Ma wê hin kes, hin mafan lutî Kurdan bikin? Bi Kurdî bê axaftin û nivîsandin çiye, neyê axaftin û nivîsandin çiye? Hin mafêñ kulturi ne, filan e yan bêvan e, kî guh dide tiştên wiha, emê şoreşâ milî ya demokratik bi ser xin, şerê gelêrî li darxin û bi ser xin, serxwebûna Kurdistanê bînîn. Ji bîlî vê têkiliya me bi tu tiştî nîne û hwd.

Helbet peyvîn wiha dikarin

Bi ya min esas tişte ku divê bê fikirin ew e ku ev çerçeve li ber çav bê girtin û bê hesabkirin ka emê bi ci awayî mudaxaleyî buyerên qonaxa iroyin bikin. Kadroyen tevgera Kurd, ronakbir, alimên Kurd, divê karibin rîska mudaxaleyek wiha bigrin ser milen xwe. Divê zanibin ku ev wê riya têkoşîna dûr û dirêj veke.

Wek peyvîn şoreşgîr bêñ xwiyakirin, lê ji iro û heta roja serxwebûnê di vê merhela dûr û dirêj de gava ku em guh nedin buyer û rûdanen rojane, mena wê ew e ku emê rûnên û li hêviya rojêñ pêş bimîn, çû mane û naverokek şoreşgîr ji di vê de nîne, zêdetir xelkê û xebatkaran ber bi pasifizmê dibe, şoreşgeran ji xelkê bi dûr dixe û wan derdixe dervayî têkoşîna muxalefeta civakî.

Çima ku em serxwebûnê di-parêzin, nabe ku em ruyê xwe ji buyer û rûdanen rojane bugherin. Mesela munaqşekirina pîrsa Kurdan, pîrsa ma-fîn ziman û kultura wan, ne

tiştekî li dervayî me ye, çareskerîna wan bi vî yan wî awayî wê tesîrê li têkoşîna gelê me bike.

Ger em têkoşîna ji bo xelasîya nîhai nedin alîkî û têkoşînê bes bi bidestxistina hin reforman nedin hudûdkirin, gava ev buyer û rûdanen siyasî pêk bêñ, çareser bibin, wê têkoşîna gelê me paşde nexîn, bi eksê, wê pêşdetir bibin.

Bidestxistina mafêñ wisa wê rî li ber têkoşîna me vezin. Loma jî divê em mewqufekî were bigrin ku em karibin fêde-kî ji guhertinan bibîn.

Li parlamentoyê pîrsa Kurdi tê munaqşekirin, lê gelek mixabin ku tevgera Kurd bê-deng e, Kurd ne li meydanê ne; ji dûrî ve temaşeyî buyeran dike.

Lê di demek wiha de ku pîrsa Kurdi li parlamentoyê tê munaqşekirin, bi kîmasî divê meydan bibûna qada meş, mitîng û protestoyê Kurdan ên legal an nîv-legal. Divê Komîten nîv-legal hebûna ku daxwaziya serbestiya zimanê Kurdî, daxwaziya qebûlkirina hebûna Kurdan bikirana û gel (cemahîr) li pey xwe biherikan-dana. Ronakbir, parlamenter, şoreşgîr û alimên ku dibêjîn em Kurd in, divê di komîten wiha de cîh bigirtana.

Bi ya min esas tişte ku divê bê fikirin ew e ku ev çerçeve li ber çav bê girtin û bê hesabkirin ka emê bi ci awayî mudaxaleyî buyerên qanaxa iroyin bikin. Kadroyen tevgera Kurd, ronakbir, alimên Kurd, divê karibin rîska mudaxaleyek wiha bigrin ser milen xwe. Divê zanibin ku ev wê riya têkoşîna dûr û dirêj veke.

Pirs: Hûn têkiliyên bi perçen Kurdistanê yêr din re çawa dibînin? Awayê têkiliyan, nawero ka wan û hwd.

Bersîv: Di mesela têkiliyan de bi perçen Kurdistan; yêr din re, ji berê de rastî partiya me politikayek hessas û hişyar daye pêşîya xwe. Rastiyek heye ku em gelek caran tînîn zi-mîn; iro, welatê me li derveyî irada me hatiye perçekirin, hûdûd bê irada gelê me hatine danîn. Li her perçê welatê me, perçekî ji mîletê me dijî û têkoşînê dide.

A yekê ew e ku, em nikarin riyekî bidin ber xwe wek ku qet ev perçebûnî tunebe. Beyî irada me be jî, perçebûnek e, hin tişt bi xwe re anîne ku divê em li ber çav bigrin. Her wekî gava em li Tirkîyê li hem-

ber burjûwaziyê Türk şer dike, li Îranê gelê Kurd li hember burjûwaziyê Îranê, li Iraqê li hember diktatoriya BAAS, li Sûriyê li hember hêzîn serdest ên Sûriyê şer dike. Têkoşînek li hember, hêzîn serdest ên cuda li dervayî irada me derketiye holê. Li welatên cihê têkoşîna li hember hêzîn serdesten cihê, bi xwe re hin rî, hin rî û dirbêñ cihê, taktilen cihê ên têkoşînê, pêşveçûnê ci-

Gava TEVGER hat damezirandin, xist programa xwe ku piştgîrî û hevkari di navbera perçan de hebe. Di vî warî de, hin guf-tûgo di navbera TEVGER'ê û Cepha Kurdistanâ Iraqê de çêbûn ji bo karkirina bi hev re, ji bo meşandina siyastike muşterek di qada navnetewî de, ji bo piştgîrî û hevkariya her du aliyan hin têkilî û hewl peyda bûn

hê bîvê nevê tîne. Divê em van li ber çav bigrin, politikayek realist bimeşenîn.

A duduyan ji ew e ku em nikarin bêjîn perçebûnî heye, têkiliyên me bi hev nemaye, her perçê bira li çara serê xwe binêre, em wiha kar bikin wek ku çar welatên cihê ne. Ev jî wê nebe politikayek realist. Em gelek eşkere dibînin ku, gelê her çar perçeyî jî, perçekî ji mîletekî ne. Bi tarîxa xwe, karaktera xwe, şexsiyet û têkoşîna xwe ya siyasi perçê tesîrî li hev dike. Ev nayê înkarkirin. Jê pêşîr dewleten dagîkir ên kolonyalist bi xwe jî, mesela perçebûnê, rewşa perçan li ber çav digrin, hesabê wan dike. Tirkîye tucarî nabêje ku, di bin destê min de perçekî Kurdistanê heye, li Kurdistanâ Iraqê, ya Iraqê û ya Sûriyê ci dibe min eleqdar nake. Welatên din jî wiha nabêjin. Gava li Kurdistanâ Iraqê büyerek dibe, tu dibîni ku Tirkîye, raste rast heqê mudaxaleyê di xwe de dibîne. Ji bo ku rî li ber buyeren din werbigire.

Loma jî, divê em tevgeren rizgariya her perçen Kurdistanê jî divê vê rewşê li ber çav bigrin, bibin xwedan siyasetek li gor vê.

Di qonaxek wiha de siyaseta

ku divê bê meşandin, gelo çiye? Helbet nabe ku em li her çar perçan bi hev re partiyekê an cepheyek deyênin û yet stratejiyek bimeşenîn. Baweriya me ew e ku di politika iroyin de divê em ber bi wê gavê de bimeşin ku hevkari, piştgîrî û avakirina muesesêni wiyo hebin ku perspektifê wan ji tespitkirina take stratejiyek pâşdetir bin, ku raste rast nikaribin mudaxaleyî stratejiya perçekî bikin.

Ji xwe li ser esasê vê politikayê, me ji bo otoriteyek milî a kar û barê her çar perçan programek pêşniyar kir, me da xu-yakirin ku navê wê karê "Kongra Milî" be. Lê em li pey navan ne bi israr in, nav ne muhîm e, ci nav dibe bira ew be.

Di pêşniariya me de ji alîkî de rastiya perçebûnê hatiye qebûlkirin, ji alîkî de jî ji wê yekî hatiye hereket kirin ku, têkiliya perçan bi hev heye, tesîrê li ser hev dike. Programek wiha hatiye amedekirin ku van her du aliyan digihîne hev.

Pirs: Kovara "2000'e Doğru" (Ber bi 2000'an ve) li ser avakirina Kongra Milî yan jî yeka wek wê hin xeber dan ku navê partiya we jî tê de derbas dibe. Tê gotin ku platformek e ku Celal Talabanî bi rîk dixe.

Bersîv: Ne ecêb e ku pîriyaniye xeberen ku di çapemenniyê (pressê) de dertêñ tehrifkirî ne, kêm in, bi derew û saşîtiyan dagirtî ne. Ger em bi vî çavî lê binêrin, em dikarin bi rehetî bêjîn ku, tu têkiliyên xeberen kovara 2000'e Doğru bi rastiyê nîn in. Ew xeberen ku dibêjîn C. Talabanî tevgeren ke milî ya ji çarperçan dest pêkîriye, birêk dixe û seroktiya wê dike, têkiliya wê bi Amerîka ve heye, yan di bin siya Sûriyê de tê avakirin, hemû derew in, bê bingeh in.

Lê ev rastî heye: Gava TEVGER hat damezirandin, xist programma xwe ku piştgîrî û hevkari di navbera perçan de hebe. Di vî warî de, hin guf-tûgo di navbera TEVGER'ê û Cepha Kurdistanâ Iraqê de çêbûn ji bo karkirina bi hev re, ji bo meşandina siyastike muşterek di qada navnetewî de, ji bo piştgîrî û hevkariya her du aliyan hin têkilî û hewl peyda bûn. Prensibî wê yekî jî heye ku piştgîrî û hevkari, bes bi herdu aliyan nemîne, rêxistin û tevgeren perçê din jî di vê de hebin. Di vê riyê de hin gav têvîtîn ku meriv dikare bêjê hêjâ ne.

Dom dike

Çîrok

Me gulle bera hev dida.

"Baratînskî"

Bi bikaranîna mafê xwe yê gulleberdanê ji bo kuştina wî sonda min hebû.

(Dora gulleberdanê -atêşê- ya min bû)

(di ordugehê de şerek)¹

Mufreza me li navça... bû. Jîya-nâ zabitê qit'akê tiştekî were ye ku her kes pê dizane. Serê siban talîm û suyarbûna hespa, firavîn ya li ba qumandarê alayê ya jî li meyxana Yahûdî, êvaran jî pûnç û îskambil. Li navça... ne maleke deriyê wê ji me re vekirî û ne jî dostikek me hebû. Di nav xwe de em kom dibûn û di van kombûnan de bêyî rutbeyên xwe me tu tiştekî din nedidît.

Di nav me de yek hebû ku ne ji ordiya me bû. Ji ber ku li dora sî û pênc salî bû me ew wek merivekî navsale dihesiband. Pirr tişdiyîn û derbaskirina wî, di nav me de jê re serdestiyek peyda dikir. Mirûztaliya wî ya her tim, şexsiyeta wî ya sert, axaftinê wî yên sert, bi şîdet tesîr li serê me yê xort dikir. Jiyana wî merivî bi perdak esrarengiz sergirtî bû. Bi qasî ku xuyabû dişibîya Rûsan, lê navê wî navê biyaniyan bû. Wextekê di mufreza suyariya sivik de bûye, di ser de jî gelek serkeftin bi dest xistiye. Çima ji ordiyê veqetiyaye, çima li vê navça feqîr bi cî bûye? Kesî nizanibû. Him di feqîriyê de dijiya û him jî jiyane comerd derbas dikir. Her tim peyatî digeriya, saqokî perîti tim li nav piya bû; lê sifra wî ji hemû zabitêna alaya me re tim raxistî bû. Firavîna ku leşkerekî çedikir ne zêdeyî du sê awayan bû, lê şampanya, fena avê diherikî. Qet tu kesî di der heqê ku çiyê wî heye, çiyê wî tuneye, hatina wî çiye, tu tiş nizanibû û di vî warî de cesareti pirsê jî nedikir. Pirtûk-xanaxak wî hebû ku bi piranî ji ese-rêni li ser leşkeriyê û ji romanen dihat meydanê. Bi kêfxwesi dida kesen ku dixwestin wan bixwînin û tu carî jî paşde nedixwest. Li hember vê, pirtûkên ku wî ji kesen din digirt paşdadayina wan jî qet nehatibû dîtin. Karê wî yê esa-sî bi şesderbê berdana nîşanê bû. Diwarêna oda wî ji dewsa gullan wek şana(kulora) hingiv qul-qulî bû. Xemla mala wî ya feqîr a ker-pîci bi tenê dewlemendiyek koleksiyona şesderban bû. Di sen'etê xwe de hewqasî bûbû hoste ku, dema bixwesta nîşanê li hirmiyek li ser şeqwê yekî ji nav alaya me bigre û wê bixîne, di alaya me de tu kesî mahzûr nedidît ku serê xwe nede ber wî. Pirê caran di sohbeten xwe de me qala duelloy-an dikir. Sîlvio (ezê wî bi vî navî hildim) tu carî tevî axaftinê wiha nedibû. Çaxa me jê dipirsî, ku gelo duello hatiye serê wî ya na, bi belêyek hişk qîma xwe dianî û tiştekî din jî nedigot. Heznekirina wî ji pirsê wiha xuya dikir. Gelo di hundurê xwe de jana bêtalihekî ku bûbe qurbanê hostatiya xwe ya muhteşem digerand? Li ba wî, ihtîmala hebûna hisek ku bişibe tirsonekiyê qet nedihat bîra me tu kesî. Çimkî ew ji merivîn wisa bû ku xuyakirina şexsiyeta wî ya ji derva bi tenê jî îmkân ji şikîn wiha re nedihîst. Lê belê bûyerek ku me nedipa, em giş mit û mat hîstîn.

Rojekê em deh hevalêen zabit li ba Sîlvio li firavînê bûn. Wek her tim yanî heta ku tê xwestin hat vexwarin. Me xwest em bi xwendiyê malê bidin qebûlkirin ku pişti xwarinê di listikê de ji me re bibe qase. Demek dirêj li dij derket. Ji ber ku hema hema qet dest nedida kaxatêñ îskambil. Dawiya dawî emri emirber kir ku kaxetan bîne û pênce çervonest(2) valayî ser masê kir, kaxet belav kir. Em li dorê kom bûn, listikê dest pê kir. Heta dawiya listikê ji devê Sîlvio peyvek jî derneket. Qet nediket munaqeşê, tu tiştek diyar nedikir. Listikvanê li hember wî ku di hesêb de şâşî bikira, tavilê ya ferq dida ya jî zêdayî dinivîsand. Ji ber ku me bi vî xusetê wî zanibû, ji idarekirina wî ya listikê re bi hawê ku wî dixwest me deng dernedixist. Lê belê zabitekî nuh di nav me de bû ku berî çendakî tayinî alayê bûbû. Vî hevalî carekî ji bêhemdî, di hesêb de çewtiyek kir. Sîlvio wek her car hesab rast kir. Vî zabitê ku texmîn kir ku Sîlvio şâş e, xwest ku izahekkê bîke. Sîlvio bêyî ku gotinekî jî bîbêje belavkirina kartan domand. Zabitê ku sebra wî nema jêbir girt û ew reqemên wek ku bê sîc û bêsebeb jê re hatibûn nivîsandin pa (xera) kir. Sîlvio tebeşûr girt, ji nuh ve nivîsand. Zabitê ku bi şerabê, bi listikê, bi hîke hîka hevalan sor bûbû, xwe marûzî heqaretak mezin dît û hîddetekê ew girt, hema bi şamdana sîfirî a ku li ser masê bû girt û virvirand ji serê Sîlvio de. Sîlvio xwe da alî, ji derbê zor xelas bû. Bîna me gişan teng bû. Sîlvio ra bû pê. Ruyê wî ji xişim sîpîboz bû, di çavê wî de ronî nema. Got:

-Efendiyê berêz! Ji kerema xwe re rabe ji vir here û ji Xwedî re şukur bike ku ev bûyer di bin vî banî de bû.

Mesele wê biçuya bigîhişa ku derê şika me yekî jî qet jê tunebû. Me hevalê xwe yê nuh ji nuha ve mirî dihesiband. Zabit got, ci heqareta ku lê bûye, amade ye ku serokê qasê çawa dixwaze bi vî awayî tâlafî bike. Wiha got û derket. Listikê çend deqen din jî ajot. Lî me dît ku xwediyê malê ne di halê listikê de ye, em li pê hev rabûn, bi bahskirina ku wê di nêz de di alayê de valayiyek çêbe em belavî malen xwe bû.

Roja din li meydana suyaran, di wê bîstika ku me ji hev dipirsî, ka gelo zabitê reben dijî ya najî, me dît ku waye ew bi xwe hat. Her nefsa vê pirsê me ji wî jî kir. Got ku ji Sîlvio hîn xeberek ne-girtiye. Vê yekî em mit û mat hîstîn. Em çûn ba Sîlvio. Me ew li hewşê dît, yekluyek kaxeta îskambil bi deriyê hewşê ve kribû û gulle lê dibarand. Fena ku qet tu tiş nebûbe, bêyî ku li ser bûyera do gotinekî jî bike bi pêrgî me hat. Sê roj di ser re derbas bûn, zabit hîn sax bû. Bi awakî mat mayî me ji hev dipirsî, me digot gelo ma wê Sîlvio qey şer neke? Şer nekir. Bi uzrek pirr ne

muhîm qîma xwe anî û pê re li hev hat.

Vê bûyerê heta tu bixwazî ew ji çavê xortan de xist. Tişte ku xort herî efû nekin tirsonekî ye. Ew, mîraniyê fazileta însan a herî bîlind dihesibîn; wê, wek tiştekî ku karibe her babet şermê bide efûkirin dibîn. Lê hîdî hîdî her tiş hat jîbîrkirin. Sîlvio tesîra xwe ya berê ji nuh ve da bi cîh kîrin.

Min tenê êdî bi qasî berê xwe nêzî wî nedikir. Ezê ku xwedî mîzacce xem û xeyala me, di dest-pêkê de ji her kesî bêtir girêdayî vî merivî bûm, ku jiyana wî bi perda siran nuxamîdî û li ber çavê min wek qehremanekî esrarengîz ê romanê bû. Wî jî ji min hez dikir. Qe nebe çaxa bi min re bû dînîtiya xwe ya tal berdida, bi şîrîniyek kêmîdî û bi samîmiyet dîpeyi. Lî belê pişti wê êvara bêxîr ku leke li şerefa wî ket, ew baweriya min a ku di nepakirina vê lekê de cardin ew mesûl e bi tu hawî ji serê min dervediket, nedihîst ku li hember wî ez wek berê hereket bikim. Hema hema min fedî dikir ku li ruyê wî binêrim. Sîlvio ne ew kes bû ku vê yekî hîs neke, di sebebê wê negihîje. Diyarbû ku vê rewşê ew muteesîr kiribû. Carê du cara min hîs kir ku dixwaze di vî warî de ji min re izahekkê bike. Lî belê ji dayina ımkânek wiha re min xwe kef kir. Sîlvio jî xwe ji min bi dûr xist. Pişti wê rojê, bes li hindî hevalan me hev û du didît. Axaftinê me yên berê yên ji dil nema bûn.

Hin tişten ku ji bo ehlîn li derî paytextê dijîn pirr muhîm in haya rûnişvanen paytextê yên tim di mitalan de ne tew jê tuneye. Payîna roja postê ji van yek e. Rojîn Sêşemî û Pêncsemîyan oda katibê alayê ji zabitêna ku li bende peran bûn, ên li bende mektûban bûn tije dibû. Pakêt hertim hema li wir vedibûn, nûcê li wir belav dibûn, bi vî hawî di oda katib de haşer mahşer radibû. Mektûben Sîlvio jî li ser edresa alaya me dihatin, bi piranî ew jî wê gavê di nav me de hazir dibû. Rojekê me dît ku mohra mektûbeke ku jê re hatibû bi bêsebîrî radike. Gava ku rîz li pê hev taqîb dikir çavê wî dibîrîqîn. Zibatêna ku her yek ji xwe re bi mektûben xwe de ke-tibûn tu tiş hîs nedikirin. Sîlvio pişti ku mektûb xwend û qedand vegeeria ser me û got:

-Geli began, rewşek heye ku divê gavekê berî gavekê ez ji vir herim. Hema işev bi rî dikevîm. Ez hîvî dikim ku hîn cara dawî hatina ba min a şîv red nekin.

Pişti ev peyvana kir vegeeria ser min û vana got:

-EZ te jî dipêm, muheqeq dipêm...

Dû re bi lez derket û çû. Me jî bi wê soza ku em li ba Sîlvio hev-du bibînîn soz da hev û em belav bûn. Di wê seeta me li hev kiribû de çaxa ez çûm ba Sîlvio, hema hema alay giş li wir bû. Eş-

Nîşan

A. S. Pûşkîn

Wergêr: Zinarê Xamo

-Tu dizanî ez li alaya suwariya sivik wezifedar bûm. Şexsiyeta min jî te fahm kiriye. Dixwazim tim bibim merivê yekem. Ji xor-taniya min de ye ihtîrasa min a herî mezîn ev e: Di dema me de moda harbûnê hebû. Tabî merivê ordiyê yê herî har jî ez bûm. Wê wextê me bi serxeşîya xwe ifşîxar dikir. Di musabeqeyek vex-warînê de min Burtsovê(4) ku Denîs Davîdov(5) di şîrek xwe de bi asîmana xistibû mat kîribû. Li alaya me pîr caran duello dihatin kirin. Ez jî ya wek şahid, ya jî wek teref di gişan de hazir dibûm. Hevalan heta sînorê ku ji min re sujde bin ji min hez dikir, lê qumandarêna alayê ku serê carê di-guherîn min wek belayek ku Xwedî şandiye qebûl dikir. Di wexteke ku min ta'ma(lezeta) şoh-rata xwe carna bi bêdengî, carna jî bi teq û req derdixist û dijîyam, rojekê ji rojan ji malbateke dewle-mend (yekî ji maleke nas, naxwa-zim navê wî bidim) xortek tayînî alaya me bû. Di seranserê jiyana xwe de ez rastî merivekî hewqas bi talîh nehatim. Carê bifikire: Xortî, zîrekî, çelengî, kîfek bi dînökî, mîraniyek ku çavê xwe ji tu tişî nakute, perakî bê hed û bê hesab; û tesîra merivekî ku xwe-diyê van tiştan hemuyan e wê li ser te bîhêle, carê bifikire. Otorîta min hejiya bû. Ew berê bi cazibîya şohreta min xapiya, xwest dos-tanîya min qezenc bike. Min rû nedayê. Bêyî ku ehemiyetî bidî ji min bi dûr ket. Bere bere min jê nefret kir. Serkeftinê ku di alayê de û di nav jinan de bi dest dixist, ez sero-binî hev kirim. Ji bo ku şer derxim li belayê geriyam. Qer-fen min ji yên min zûtir û hîn bi tesîrtî û qet şik tune ye ku bi qer-fen ji yên min bi nîtek hîn baştîr li min vedigerand. Wî bi henekî digirt. Lî ez, her ku diçûm kîndar dibûm. Di dawiyê de rojekê di ba-loya Polonîyekî xwedî çiftlik de wexta min dît ku hemû jin, a hîn jî girîngîr, xwediya malê ya ku têkiliya wê bi min re hebû li dora wî wek perwanê doş dibûn, hema xwarî guhê wî bûm û min çend gotinîn pirr bêedeb jê re gotin. Bi carê de hîrseke mezin ew girt û ez sile kirim. Me dest avêt şûrîn xwe, ji pîrekan hinek xewirîn, ket-in navbera me û nehiştin em şer bikin. Ü hema wê şevê me biryâra duellokirinê girt.

-Ji ber ku min hesabê bîneza-kiya R.yê serxeşî qesmer jê ne-pîrsî te xerîb dît, ne wîsa? Heta ku ez xwediyê mafê hilbijartina sîlehe bîm jiyana wî di dest min de bû, hîvî dikim tuyê vê qebûl bikî. Ji bo min hema hema peyva tehlîkî tunebû. Reva xwe ya ji duelloye bi rehetî ez dikarim bi mezinaya xwe izah bikim, lê nax-wazim derewa bikim. Heger min karîba heyata xwe ji sedî sed bi-girta garantiyê û R. ceza bikira ji kirina wê min bîstekî jî xwe ra-nedigirt.

Min bi heyret li Sîlvio mîze-ki. İzahekkî wîsa ji guçê aqîlê min jî derbas nedibû. Sîlvio gotinîn xwe domand:

-Dixwazim vê bibêjîm: Ez ne xwediyê mafê xwe avêtina tahlîka mirinî me. Min şes sal berê silak (şîrmaqek) xwariye û dijiminê min hîn dijî.

Meraqê bêtir ez girtim, min jê pîrsî:

-Te ew ban duelloye nekir? Ya jî tişten ku rî li ber te digirtin hebûn? Sîlvio bersîva min da, got:

-Me duello kir. A ji xwe jîbîr-nebûna çiroka duelloya me jî di vir de ye.

Rabû ji qutiyek kartonî şewqakî sorî qeytanî bi guluk, bi şerît ku Fransiz jê re dibêjin bon not de police(3), da serê xwe. Bi qa-sî çar santîm û nîva bi ser sîperê re quelek lê hebû. Gotinîn xwe do-mand:

1- Ji çirokek A. Marlinskî (wergêr)

2- Perê Rûs ê zérîn di qîmeta 3 Rublan de.

3- Şewqê polisan

4- Bortovi: Di alayê de zabi-teki bi serxeşîya xwe bi nav û deng (wergêr)

5- Denîd Davîdov: (1781-1839) Niviskarekî Rûs (wergêr)

(Dûmahîk di hejmara bêde)

Di Kampa Multeciyen ya Qiziltepê de

Zêdeyî 2000 Kurd jehrdadayî bûn



Ev kampa hêsîra wê hê bibe şahidên ci wehşet û sosiretan!

Di 8'ê Heziranê de li kampa Qiziltepê 2000 multeciyen Kurd bi xwarina nan jehrdadayî bûn. Zêdeyî 70 kesî ji heta derecêkê felc bûn. Li ser vê bûyerê çûn û hati-

na rojnamevanan li kampê hat qedexekirin, makînên multeciyen ên rismen ji wan hatin stendin, derketina multeciyen ji kampê hat qedexekirin.

Leyla Zana vexwendeyî civîna "Mafêni Mirovî û Aşti'yê bû

Xanima Serokkomarê Fransa François Mitterrand; Daniella Mitterand ji bo civîna "Mafêni Mirovî û Aşti" yê ku bi munasebeta 200 saliya Şoreşa Mezin a Fransa tê çêkirin, xanima serokê belediya Diyarbekirê yê kevn Mehdi Zana; Leyla Zana daweti Parîsê kir.

Ev civîna "Mafêni Mirovî û Aşti", di çerçeva Rêxistina Mafêni Însanî de ku girêdayî Netewên Yekbûyi ye, tê çêkirin. Li gor agahdariya amade-karan xususiyeten kesen ku di civîne de besdar dibin, ev in: "serokên civakên ku tê pelçiqandin, kesen ji bo mafêni mirovî hatine girtin, işkence, an jî tade û zilmê dîtine".

Wek tê zanîn Mehdi Zana ji ber welatperwerî û şoresseriya xwe ji sala 1980'yî ve girtî ye. Xanima wî Leyla, heta nuha di hemû tevgerên piştigiriya bi berxwedanên girtiyen re besdar bû.

Danille Mitterrand du meh berê, di gerra xwe ya Kurdistanê de, li Diyarbekir Leyla Zana ji ziyaret kiribû.

"EZ Kurd im"

"Hêdî... hêdî"

Ji dervey Campolat nûnerên Awusturya û Franse ji bi çend gotinan bahsa rewşa Kurdan kîrin.

Di nav mîvanên Kurd de bi tenê jinekê (di beşê Enternasyonala jinan) de keysa peyivînê bi dest xistibû. Ew ji Hêro Talabani; pireka Celal Talabani bû. Hêro Talabani di nav sê deqîqan de bi tenê li ser rewşa zarokên Kurdistana Iraqê peyivi. Bahsa girtin, işkence û idamkirina zarokên Kurd kîr. Û hêvi dikir ku Enternasyonala Jinan di deklerasyona xwe de bahsa jin û zarokên Kurd ji bike.

Lê disa mixabin... Di deklerasyonê de kelimeyek ji tunebû. Û Hêro Talabani geleki li ber diket, digot: "EZ hê ji bawer nakim, çawa dikarin waha bikin"

tin girtin. Firna ku nan dida kampa Qiziltepê ji alî Waliyê Herêmî ve 15 rojan hat girtin û xwediyê wê kirin nezarefî.

İsmail Zubeyr ku yek ji berpirsiyaren Komîta Kampa Qiziltepê ye ji nûçegihanê kovara Medya Gunesi(hejmar 9) re wiha dibêje: "Wê rojê dîsa di wexta xwe de nan anîn kampê. Yê ku nan xwarin, di nava 10 deqîqan de gêja wan çû û vereşîyan. Pişti re doktorê kampê got ku di nan de jehr heye. Li ser vê yekê em çûn nexweşanê, ji me re gotin derew e, jahr di nan de tuneye. İcar zêdeyî 2000 kesî di çadîrên kampê de bi hebêñ êşrawestadinê têndavâkirin(!). Ü zêdeyî 70 kesî ji bi jehrê felc bûn û tu tedbîrek nayê stendin. Pişti vê bûyârê derketina me ya ji kampê hat qedexekirin."

Mihemed Şêxo li Parîsê hat bi bîranîn

26'ê meha Gulânê; sala 1989'a li bajarê Parîsê ji aliye hevalên hunermendê Kurd ê bi nav û deng; Mihemed Şêxo şevez bîranîne hate çêkirin.

Armanca şevê ew bû ku hunermend M. Şêxo tim bê bi bîranîn û hatina şevê ji zarokên wî re wek alîkariyê bêşandin.

Bi besdariya hunermenda Kurd a bi nav û deng Şêrîn, bi huner û sazên Koma Zozan û bi amadebûna Kurden Parîsê şevezek xweş amade bû.

Hunermendê Kurd Şivan Perwer soz dabû ku besdarî şevê bibe, lê mixabin ji ber mercen derveyî daxwaza wî nikaribû besdar bibe.

Destpêk r.3

piştigiriya Kurdan bikira. Ji ber ku xelkê Kurd, ku 35 milyon e, di bin zilmek sîstematik de ye. Zilma li ser gelê Kurd di çaxê modern de zilma heri mezin e.

- Te got 35 milyon... Te di peyva xwe de ji got 35...

- Nizanim, dibêjîn di nav 25 û 35 milyonan de... Tu dibêjî min kêm got?

- Na, na. Min meraq kîr. Te ev hejmar ji ku aniye.

- Min got bira kêm neyê gotin.

- Tu bi rizgariya mîletê Kurd bawer i?

- Belê. Lê bi Kurdistanaka serbixwe ne bawer im. Armançek realist nîne. Sînorîn ew çend dewlet guhertin tiştekî hêsan nîne. Divê mîletê Kurd di nav sînorîn van dewletan de azad bibe.

Hindik-Rindik

Kehaneta Ozal

Serokwezirê Tirkîyê Turgut Ozal di beyanek xwe de gotibû ku, "Ji bo xweşîrin û modernkirina hefsan ezê hemû imkanan bi kar bînim". Û pişti vê beyanê di vi warî de bi rastî ji hin gavan davêje, dest bi modernkirina hefsan dike. Li ser vê jê re dibêjin:

- "Ji bo ci tu wiha dikî? Perên ku tu li modernkirina hefsan xerc dikî heger tu pê mekteban ava biki ma wê geleki ne baştar be?"

Turgut Ozal dibêje:

- "Pişti vî temeni(umri) ma qey ne ezê herim meketebê... Lê ki dikare bibêje ku ezê rojekê nekevîm hefsê."

Gotina Piraniyê

Di nexweşxana aqil de doktor ji nexweşê xwe hin pirs dipirsî.

Doktor:

Bi qasî ku ez dibînim tu merivekî tebitî û sakîn î. Gelo ji bo ci tu anîn vira?

Mêrikê nexweş pişti ku bîstekê fikirî got:

- Pîrî hêsa ye. Ji ber ku min ji her kesî re digot hûn dinin û her kesî ji ji min re digot tu dîn î."

- "Ê dûre çawa bû?"

- "Ma wê çawa be! gotina piraniyê qebûl bû."

Seriye bê meju

Mêrikê qeraş her ku diçû malê jina wî pêre şer dikir, digot:

- Nebixêr, tu dibê qey li dînyayê sene't nema, çû ji min re bû qeras.

Ez rebena Xwedê êdî bi be şuştina kincen te yênardin re nagihêm. Peyen xelkê tivingen wan bi milê wan de, şuştî miştî, her êvar wek mîran vedigerin malen xwe; yê min, serapê dibe ard û tê. Ji bo ku meriv nas bike divê bi qalibek sabûn bê şuştin...

Her êvar hal û karê wan şer bû. Demek hat mîrik êdî ji pilî-pila jînikê bêzar bû, rabû aşê xwe firot û çû ji xwe re tifingek kirî. Pişti tiving kirî, êvarekê ji jînikê re got:

- Jinik, min aş firot û tiving kirî, ka ezê bi vê tivinge ci karî bikim?

Jinik got, "ma tu yê ci karî bikî? Tu ji wek peyê xelkê here ji xwe re diziyê bike..."

Li ser vê gotinê di şevez tarî de mîrik li gund çû da-ket neqebekê. Lê ji qeza quđretê re çîma xwediyê malê pê nehesiya. Wi bazda, xwediyê malê ji pare lê girê da. Di wê şeva tarê de çîma gullak neçû li serî neket. Di cî de wergeriya. Hatin rakirin, mîze kirin ku waye hîn ruh tê heye. Milet li ser serî kom bû; ji her seriye dengêk derdiket: hinekan digot "derb li serî ketiye, zor e. dernakeve..." Hinekan ji digot, "na na, waye li ciyê şen neketiye, ku meriv karibe jê derxe wê xelas bibe."

Ji nav gundiyan yekî kal got:

- Derxistinê ez dikarim derxim. Lê belê bêxwediya gullê li nêzî meju sekinî ye, ez ditirsim kîr li meju keve..

Di vê navê de birîndar bi xwe hesiya û got:

- Na na qet metirse, hema derherma meju ji tê tune ye. Ma heger meju tê heba, min aş difrot û dibûm diz...

Li Stavangerê "Roja Kurdi"

Roja 24'ê Heziranê li Norveçê, li bajarê Stavanger, bi hevkariya Komela Karkerê Kurd û komuna Stavanger festivalek bi navê "Roja Kurdi" hat amade kîrin. Kurden Stavangerê li alîkî govent girtin, helbest xwendin û xwarinê Kurdi çêkirin, li alîyê din video, raxistîna resim, foto û pirtûkên Kurdi

Fosilekî mîlyon salî

Di destpêka meha Heziranê de li gundê Demirkent ku girêdayî qeza Akyaka ya Qersê ye, fosile mamûtê ku ji cinsekî filan e hat ditin. Roja pêşin berpirsyarên Muzyea Qersê gotin ku ev fosile trînazor (dinazor) e. Lê, pişti lêkolînên li universita Erziromê derket ku ev, fosil ji mîlyon sal berê maye û yê mamût e. 65 mîlyon sal berê koka dinazoran hişk bûbû.

Li gor malûmatan ev fosil hestiyê ling e, 110 cm dirêj e, 72 cm qalind e û 48 kilogram giran e.

H e Ş

Arêkerdox: Malmîsanij

Bi w' çinébi. Di cinîyê xu (xo) r' şî kulîya. Yo hep weş ame, yo hep wape mend. Haw ku weş ame, hîwîye cinîye vinderd. Şîye hon ra. Haw ku wape mend ame **ko** yo hon di. Ya nihesna. Ami kehe. Cinîye bîni k' xu(?) hesiye ko némi şaw. Kulî xu der we, niwaşt ra. **Fetliye** ko heş ya ser a.

Heş ya başı lan' xu. Yo lacek ci r' bi. Fek' lan heş bi roc qawno. Mîyen' lan yo tîrinç' roc fina. Haw lacek xu den pero. Nişko devşa, teyşîya. May ci ci r' vano:

- Haw çiba w?

Lacek vano: -Yo çiba tîye bi, mi nişka devîşfini.

May ci ci r' vano: -Hana tîrinç roc û (o) law. Roc esto, bi şaw esto.

Lacek vano: -Ko hecuna êçi r' ma tîye vinderda?

May ci vano: -Ênê law fek' lan qawnîye w.

Lacek fek' lanke a xu r' şîye ko heş ko qoçık ti; yo çenti pir qoçık kerdo, haw cinîye rî beşeni. Cinîye terso: "Hanhey ma kuşu".

Zey ci, goy ci teyna man' heş. Yo qui dan' heş ri, heş miro. Ciniye o zey xu yenê daw. Mêrdi cinîyê esto. Milet'

daw, haw mîrik rî vano:
Zey to zey heş o. Ya bikuşê!
Çiyay Hatî-Nehatî kulîya. Şen' haw çiya xu r' kulî top kero winî tera ko yo şer gay ci wero. Şer ri vano:
- E to r' vana mewu! E to ker bin' parx-êl...
Şer gay ci wero, haw lacek yeno ya ker bin' parxel, gir dano. **Don jî** winî tera ko yo heş gay ci wero. Lacek heş rî vano:
- Mewu, **ez** to ker bin' parxel!
Heş gay ci wero. lacek yeno, heş ker' bin' parxel, gir dano, yeno daw. Milet daw pêw ci r' remo.
Yen' kehe. Haw şer o heş ver do şena xu rî.
Haw lacek may' xu r' vano: -E zana ko şima mi kér' vinî, **ez** xu r' şena.
May' ci ci r' vano: -Meşo law!..
Lacek vano: -**Bi xatir' to**.
Şen' yo del (?) winî tera ko yo duman vaz ra. Şen widi ko yo kalik yo quşxanı **savar** naw ser a, pocû. Lacek vano:
- Selamo 'elek.
Van': -Eleykomeselam.*

*Na estaneki, mi 1979 di zey vatisê yew xortê Motkîyîji (yew dewijê qezayê Motkî) nuştî.
Motkî (Mutki) : Yew qezayê wîlâyêtê Bedlis (Bitlis)'î yo.

FERHENGOK

ami : ame, hame, home, ome
başı : beno, bîşûno
bikuşê : bikişe, bikişi
bi xatir' to : xatir bê to, xatir be to, xatir ve to bo
ci : ci, jey, dey, ey, yê
cinîye : cinî, cenî, cîniye
ci r' : ci rî, ci rî, jey rî, yê rî, tira
çenti : çente, çante, çonte, pêlek
çiba : çî, çiva, çiwa, teba, tewa, tuwa, toa, towa
çiya : ko, koh, kuwe
daw : dew, dewe, dewi
den' : dano, dono, don', deno
devşa : depîsa, tepîso, tepso, tebîso, tewoşo
e : ez
fetliye : feteliyay, feteliye, ageyra/agey-ray
goy ci : goşê ci, gûşê jey, goşê yê
hana (hena) : na/no, ena/eno, ina/ino, cina/ca, cîn/cine
haw : a, aw/aya, ay, ayo, we, ew, ewe, ewi/eya, wi/ya, hew, hewe/heya, o, û
hep : heb, ten, tene, têni
hon : hewn, hown
kalik : kal, pîr, kokim, extiyar, exter
ke a : kerd a, akerd/ake, kerd ra
kehe : keye, kîye, çeye
ker' : keno/kena
kîr' : bikerê/bikerî/kerê, bikirî/bikir';kenê, kenî, ken'
ko : ki, eke
kulî : kolî, izim-î
kuştiş : kîştiş, kîstiş, kîştiş, çîştene, kîstene
kuşu : kîşeno
lan : lane, lani, lone, lon, quli
man' : maneno, moneno
mewu : mewere, mewiri, mewri, mew'
mîrik : mîrik, mordemek

Deyîrê ma

Arêkerdox: Malmîsanij

DINGIR O BANÎ SER O

Dingir o banî ser o¹.
Verg bêro, tişkî bero.
Alîyê Hama² se kero?
Gî di erdîsta xo kero.
Riwen o nanî ser o.
Verg bêro tişkî bero.
Dedo³ tifing çê kero⁴.

1 Na deyîra qeçekan (gedan) zey vatisê yew dewijê qezayê Alduş (Gerger)'î nusiyaya.

Alduş: yew qezayê wîlâyêtê Semsûr (Adyaman)'î yo.

2 Alîyê Hama: yew dewijê qezay Alduş'î yo.

3 ded: dat, ap
dedo: dato, apo

4 Vatisê yew dewijê qezayê Çermûgi gore, tay dewanê Çermûgi di yew varyantê bînê na deyîri zî wina wo:

Ding ding a (govend a) banî ser o.

Riwen o nanî ser o.

Verg bêro tişkî bero.

Keko ci rî se kero?

Keko tifing çê kero.

XECIK Ü REMZAN¹

Banê Mirêba² berz o,
Remzan ver o bilerz o,
Xecik buxça tê derzo .

Xecik a dêsi ver o,
Pîncleyr³ o Xecik ver o.
Remzan o keno bero.

Raya Pîrgol⁴ raşt a,
Xecik beşni viraşta,
Remzanî erdiş⁵ taşta.

Mangeyê Mirêba borr î,
Destê Xecik qilor⁶ î,
Riwen arê da dorî,
Rîsto welatdê corî.
Giwanê⁷ manga bî korî.

1 Na deyîri zey vatisê yew Çermûgi nusiyaya. Vatisê nê Çermûgi gore na deyîri deyîra dewa Nişnik a.

Nişnik yew dewa qezay Çermûg a, Dewleta Tîrkiye namey na dewi vurinawo, kerdo Petekkaya.

2 **Mirêba** : Vatisan gore dewa Nişnik di leqama (leqebla) yew ayle (aile) ya.

3 **pîncleyr** : pînc, bînc, bîncurrik
4 **Pîrgol** : Namey yew (jew) cayê nizdi dewa Nişnik o.

5 **erdiş** : erdiş, eriše, eriş, eyşî

6 **qilor** : gilover, gulover, gûler, gîlî, gudlikin, gudikin,

7 **giwan** : guyen gon (gonî), gün (guni), cize, çice, çici, çice, çicik, çije, çize, çizik, cizik

KÜMEK A KÜMEK KİST A¹

Kûmek² a kûmek kişt a,

Teyrekê pa aniştâ³.

Kekoy jî xo rî kiştâ,

Dismalda xo ra piştâ,

Waştîyerda xo rî riştâ.

Waştî kor bimano,

Dismala gunîn pey di riştâ.

1 Na deyîri zey vatisê yew dewijê qezayê Çermûgi nusiyaya.

2 **kûmek**: kûmi, komi, kuwemi

3 aniştâ: niştî, nistene, niştene, pa niştî
aniştâ: niştâ, nista, pa niştâ, niştâ pa

XERİBÊ

Hay nay nîna, nîna, nîna!

Hay nay nîna, nal Xeribê!

Hay nay nîna, nîna, nîna!

Hay nay nîna, nal Xeribê!

'Eledînî terş û dewarê xwi roto.

'Eledînî terş û dewarê xwi roto.

Pey yew filîte giroto.

Pey yew filîte giroto.

Pey ganê Hes û Huseynî weranto.

Pey ganê Hes û Huseynî weranto.

Hay nay nîna, nîna, nîna!

Hay nay nîna, nal Xeribê!

Hîrê tenî hanî ha cêr o yenî.

Hîrê tenî hanî ha cêr o yenî.

Yew verê o, di peyen î.

Yew verê o, di peyen î.

Ayo verê helalê gandê min o.

Ayo verê helalê gandê min o.

Wirdî peyenî dişmenê mîre min î.

Wirdî peyenî dişmenê begê min î.

Peynî (peyeni) mîrê mi kişenî,

Peynî lajekê mi kişenî.

Hay nay nîna, nîna, nîna!

Hay nay nîna, nal Xeribê!

Tirîni(Tirêni) hanî ya ha cêr o yena.

Tirîna siyay ha cêr o yena.

Qazanê xwi minawre kena.

Qazanê xwi minawre kena.

Ez bîlatê xwi birnena.

Ez bîlatê xwi birnena.

Ez El'ezîz di peye bena.

Ez El'ezîz di peye bena.

Hay nay nîna, nîna, nîna!

Hay nay nîna, nal Xeribê!

EŞMO ŞEWA İNÎ YA¹

Eşmo² şewa inî ya,

Sûrya³ rî keyna bîya.

Keko bira şo bîya.

(Hacî Baba şo bîya).

Ne way a ne waştî⁴ ya,

Keyna Xidirdê Bekçî⁵ ya.

1 Na deyîri heway vatisê yew dewijê qezayê Çermûgi nusiyaya.

2 eşmo: emşo, emşû, emsû, esmo, esmû

3 Sûrya: Nameyê cinî (cenî) yo.

4 waştî: waşta

5 Xidirê Bekçî: Vatisan gore yew (jû) dewa Çermûgi ra wo.

Na Xumxum a...

Arêkerdox: Koyo Berz

Dûmahîka Nûçan

"Divê em bi gelê xwe û ..."

çekên atomî ji Kurdistanê bêr rakirin û tevî wan, hemû çekên kîmyewî û bîyolojik bi temamî ji ortê bêr rakirin. TEVGER gazi gel dike ku bo van armançan kar û xebatê bike".

Belavok dû re qala enca-mêm Konferansa Parastin û Hevkarî ya Ewrûpa (KPHE)'ye dike û dibê "di-vê ew maf û azadî ji bo gelê Kurd ji bî cî bêñ". Her bi vê armancê, bangî civîna Parîsê ku dewema vê konf-ransê ye dike.

Belavok dû re qala enca-mêm hilbijartina 26'ê Adarê û buyerê pişti hilbijartîne dike: "îro li Tirkîyê û li Kurdistanê têkoşîna hêzîn demokrat û rizgarîwaz li


dijî faşîzma 12 Îlonê û hê-zîn kolonyalist bi xurtî berdewam e. Îsal, di hilbijartina 26 Adarê da milet derseke baş da ANAP'ê û hukumeta wê ku hêzeke 12 Îlonê ye û krasê sîvîl kışandîye xwe. Di hilbijartina heremî da hêzîn welat-parêz li Kurdistanê jî li Dîyarbekir û li gelek cîyê din, li dijî zulm û zordestîye platformeke baş ava kirin. Dîsa, protestoyê karkeran li Kurdistanê û Tirkîyê li dijî birçîşyê, betalîyê ji bo destxistina ma-fen sendîkâli di Adar û Gu-lana çûyî da giha dereceke bilind. Faşıya 12 Îlonê xwest bi darê zorê pîrsâ Kurd bi temamî ji bîr bibe

û zordestîya xwe gihande wê derecê ku, li dawîyê ev pîrs bi destê xwe germ kir. Êdi zordestî jî pere nake. Pîrsa Kurd niha ne tenê li dorhêlîn çep, di kovar û roj-namên bûrjûwazî de, di parlamena wan de jî tê qiseki-rin û derdikeve warê navnetewî. Gelê Kurd, li dijî ewqas zulm û zordestî jî, îsal karibû gelek bend û qeydan bîşkîne, Newroza xwe li bajaran, li gundan, li mekteban û di kampên mil-teçîyan de pîroz bike. Li alî din, rejîma faşî, di Yekê Gulanê da cardin rûyê xwe nîşan da, xwîn rijand û nehişt ku cejna karkeran bi serbestî bête pîrozkirin.

□

Xaçepîrs

Amadekar: S. Rêving



Çeperast: 1-a) Cihêku mirov diçe seyra-nê, b) Cihê genim lê di-hêrin. 2-a) Pronavek di Kurmanciya jorî de. b) Navê kovareke Kurdî, edebî ku li Kur-distana İranê derdiç. 3-a) Xwarineke dewar-an (berevajî), b) Cûrekî mişkîn mezîn (berevajî), c) Jê nan çê di-kin. 4-a) Koma heywa-nê hov an kûvi. b) Navekî kuran. 5-Navê rojekê, b) Kûçik (berevajî), c) Du herfîn bê-deng. 6-a) Lekerê fiki-rin, hizirkirin, b) Xwi-dan, westiyana ku di ber kareki de diçe, e-meg. 7-a) Li devera Behdinan ji dara "Çam" re dibêjin. b) Paşnavê helbestvane-kî Kurd ê navdar. 8-a) Cûrêkî kûçika yê ku nêçirvan bi xwe re di-bin nêçirê, b) Cihek ji laşê meriv. 9-a) Sino-nîmek bo "ar", "ar-van". b) Spehi, ciwan. Her weha navê kuran e ji, c) Heywanek. 10-a) Di Kurmancî de pro-navek kesîn. b) Lêke-

ra, "çekirina" nan. 11-a) Kar, şixul. b) Du herfîn dengdar. c) Bi Soranî "bav", "bab". 12-a) Nexweşiyek (berevajî), b) Li devera Behdinan ji bo "zelzele", "deprem" û dibêjin.

Serejêr: 1-a) Helbest-vane-kî Kurd ji Kurdistana Iraqê ku bi na-vê "Şin û Şadi" û "Dî-listan" du dîwanêni wî çap bûne. 2-a) Pronavekî kesîn, b) Navê ci-hekî ji laşê meriv, c) Sînonîmek ji bo "kok", "rih" (berevajî), d) Şe'ire. 4-a) Gundekî Kurdistana Iraqê ku dikeve nêzî "sînorê" Tirkîyê û balefirê Ir-

aqê di sala 1979'an de bi hêceta "kuştina pêşmergan" nêzî 30 gun-diyyênd gundekî qezâ Çelê (Çukurca) kuştin ku çûbûn giya dirûnê (berevajî), b) Peyveke her tim di pêşîya pir-siyan de têt. 5-a) Peyv, bêje. Bi me'nâ "xeber", "dijûn" de jî kar têt (berevajî), b) Jina ku mîrê wê mi-ribi an ew berda be. 6-a) Cêrê mezîn ku ji axa sor çêdîkin û li deve-rên germ ên Kurdistana-ava vexwarinê dik-inê ku avê sar dike (berevajî), b) Kesê ne siwar, yê peyatî diçe (berevajî). 7-a) Navê darekê, her weha navê keçan e (berevajî), b) Bi Soranî daçekek. 8-a) Formê emir jî lêkera "sekinin" (berevajî), b) Heywanê hov, dirinde. 9-a) Navê wî cihe gum-lekan, işligan yê tê ser zenda meriva û meriv bi pişkakan wir digre, b) Rê an cihe pir bilind û asê. Bi Tirkî jê re "uçurum" dibêjin. 10-a) Bapîr, pîr. b) Pro-navekî işarkî (berevajî). 11-a) Şekil, terz. b) Vajîya giriyê, c) Du herfîn bêdeng. 12-a) Navê zozaneke pîr bi nav û deng li devera Çolemêrg û Wanê, b) Navê çemekî li Kur-distana Iraqê (berevajî).

Bersîva hejmara 91'ê

Çeperast: 1-a) Qelediz, b) nîrx, 2-a) kade, b) Çax, 3-a) mar, b) zîmher, 4-a) Erê, b) af, 5-a) ûsta, b) işk, 6-a) rî, b) parî, c) aş, 7-a) ya, b) şe, c) aramî, 8-dawî, b) vegir, 9-a) mû, b) va, 10-a) ken, b) den, 11-a) qend, b) ran, c) na, 12-a) de, b) ewlehî

Serejêr: 1-a) Qemçûr, b) dûnde, 2-a) ade, b) Siyamend, 3-a) teral, b) aw, c) ke, 4-a) ek, b) par, c) tî, d) qe, 5-a) sê, b) şâ, 6-a) çi, b) revde, 7-a) Zazakî, b) erd, 8-a) xifş, b) ga, c) ah, 9-a) virnî, b) in, 10-a) ho, b) Aras, 11-a) çam, b) ta, 12-a) xırş, b) Şîrwan,

"Divê şerê me têkeve..."

yan di vî warî de alîkariya wan kirin. Di nav seetekê de 77 gund wêran kirin. Ji bo hemû cîhanê rûresî ye, ku Iraq hîn endamê Netewê Yekbûyî ye.

Mesûd Barzanî axaftina xwe wiha domand: "Iraq nuha jî bixwaze dikare li hember me çekên kîmyayî bi kar bîne; ji ber ku ji cîhanê tu reaksiyonek mezin nedît, ev bêdengî cesare-tê dide wan.

Emê ci bikin?

Mesûd Barzanî di vî beşî duduuya yê axaftina xwe de jî bi pîrsa "Di rojêne pêş de emê ci bikin?" axaftina xwe domand: "Divê bi rastî em siyaseta xwe biguherînin, em takîkîn xwe biguherînin. Divê em dîstina xwe ya şer biguherînin. Li Kur-distana şer sed salî jî dom bike ne xema Seddam e. Divê şer têkeve nav Iraqê".

Pişti axaftinê, guhdaran gelek pîrs jê kirin. Li şer pîrsa siyaseta Sovyet li

hember Kurdan, M. Barzanî got: "Sovyet îro alîkariya me neke jî em bawer dikin wê sibê bike. Em Sovyet dostê xwe dibînîn.

Bersîva pîrsa, "gelo heta nuha tu welatek ji we re bûye dostê stratejik ya na?", wiha da: "Na, mixa-bin ku heta nuha tu welatekî ku ji me re bûbe dos-tekî stratejik çenebûye û îro jî tuneye. Lî têkiliyê me yên dostanî bi hin welatan re hene".

Di pirsekê de rexne li welatên Ereb dihat girtin, ji ber ku dema qetîlama He-lepcê wan alîkariya Seddam kiribû. Di bersîva vê pîrsê de M. Barzanî got: "Bê gu-man welatên Ereb alîkariya me nekirin. Lî divê em bi-zanibin li welatên Ereb kî li şer hukum in?! Ew ne tenê dijminê me, her wisa dijminê gelê xwe ne jî. Lî li alî din hemû hêzîn Ereb ên demokrat, pêşverû û kom-munîst, hêzîn Filistînî yên pêşverû qetîlama Helepcê protesto kirin û van hêzîn

pêşverû hemû dostê me ne. Divê em mesela xwe nekin rengekî dijiminatiya Kurd û Ereban. Ji xwe dijmin jî tiştekî wisa dixwaze.

Di derheqê şerê di navbera PDK-Iraq û PDK-Îran de jî hin pîrs hatin kirin. Di vî warî de jî Mesûd Barzanî got ku, "Me ew gelş pîrr li dû xwe hîştiye û nuha pro-blemek me ya wisa tuneye. Di mesela xebata bi hev re, wetoya me li dij tu hêzîn tuneye; em qîmetek mezin didin hevkariya hêzîn Kurd.

Di dawiya axaftina xwe de Mesûd Barzanî ji hemû Kurdîn li derveyî welat dax-waza alîkariya maddî û man-newî kir û got, "Divê hûn bi xebat û alîkariya xwe moral bidin hêzîn pêşmer-gan. Li alî din divê hûn za-rokên xwe bi ruhekî Kurd-perwerî mezin bikin, divê ew ji Kurdayetiya xwe bi dû nekevin".

Ji serî heta dawiya civînê gelabaliyek pîrr mezin bi balkêşî li axaftin û bersîven Mesûd Barzanî guhdarî kir.

"Kurd di bin zulmek..."

Enternasyonla Sosyalist dike ku pîrsa Lubnanê çareser bike û ji bo Lub-nan bîghê rewşek demokratik xebatê bike.

2) Partiya Pêşverû a Sosyalist bangê Enternasyonal Sosyalist dike, bi kar-anîna çekên kîmyayî li herêma hatiye bi kar anîn bi acili bête qedexekirin û roja 16'ê Adarê- di 16'ê Adara 1988'an de bi ga-zîn toksîk bajarê Ha-lepcê hatibû bombekirin-li cîhanê bibe roja ji ortê-rakirina çekên kîmyayî.

Herçiqas di sala 1920'an de bi Peymana Sewrê mafê wan hatiye naskirin jî di sala 1923'an de bi Peymana Lozanê dîsa paşde hat stendin.

îro jî gelê Kurd bi tay-beşî li Iraqê di bin zulmek hov de ye. Ji milyonekî zêdetir mecbûrî surgû-nê bûne, nêzî 8000 kesî bûne qurbana çekên kîmyayî û nêzî 4000 gund jî ji holê rabûne.

Partiya Pêşverû a Sos-yalîst ne terefdarê dew-letek Kurda a serbixwe

Rewşa Kurda trajediya xwe...

Kongrê, di belavoka xwe ya dawîn de cara yekemîn cih da pîrsa Kurd û da diyarkirin ku "Rewşa Kurda trajediya xwe didomîne".

Komîta Karûbarêne Derve ya TEVGER'ê ji li şer rewşa Kurdan mesajek şand ji nûn-ren kongrê re û dax-waz kir ku li şer rewşa

Bangek

Zarok û ciwan hîştiye heri mezin yê netewa me nin. Ewê bibin berpîrsyaren parastîna çanda me. Pêşdabîrtina qabilîyeta(behreyê) veşarti ya zarokan erkek me ya mezin e. Ji bo bi pêşxistina hunerê zarokan û nişandan hunermendîya wan, kovara "KOÇER" dixwaze pêşangeheke ji rismen zarokan çê bike. Ji bo wê, daxwaza ji zarok û xorîn Kurd, her li ku dibin bila bibin, em dixwazin ku alîkariya me bikin, berhemîn xwe ji me re bisînin. Li gel berhemîn xwe dîbe sûreteki, nav, navnişan û temenîn xwe û kurtebasek ji jîyana xwe ji ji me re bisînin.

Li alî din em daxwazê ji de, bav û mamostayen berêz dikin ku ew ji ji bo teşwîqkirin û beşdarbûna zarokan a pêşangehê alîkariya wan bikin.

Pêşangehê di Newroza sala bê de wê çê bibe. Hemû kesen heta temenî 18 sali dikarin beşdarî pêşangehê bibin. U heya roja 15.1.1990'i ji dikarin berehemîn xwe bisînin.

Ji berhemîn beşdar wê ji bist(20) rismen pêşin re xelat bê dayin. Hün berhemîn xwe dikarin ji vê navnişana jîyana re bisînin:

KOÇER

Box: 20 68
172 02 Sundbyberg
Sweden

Armanc

SERXWEBÜN DEMOKRASİ SOSYALİZM



Di ser ïdamkirina serokê
serîhildana mezîn a
1925'an Şêx Seid re 65 sal
derbas bûn. Em vî şebîde
xwe yê mezin û hevalên wî
bi giramî bi bîr tînin.